



Medyaya femînîst

Di platformên medyayê de bikaranîna ziman ji aliyê rêgez û bikaranîna têgehên femînîsttan ve nêzîkatiyên jinan nîşan dide. Navroka wan femînîst nebe jî nêrîn û bikaranîna ziman femînîst e. Hêz di destê jinan de ye. Zayenda civakî esas tê girtin... *Linda Steiner / R.2*



Mêrên avis

Wexta mirov strana dayika xwe nebêje, mirov di nav rastiya civaka xwe de wek mêrê avis e. Ew mêrê avis di nav sanciyên bindestiyê de xwe digevizîne û diçe. Kurd ne 'mêrên avis' dixwazin ne jî zimanê bindestiyê dipejirînin... *Enes Yıldız / R.5*



Karah Kaplan

Ev romana jîrbûyî li benda şîrovekirina xwînerên xwe ye, bes bi berdêla xwendina 871 rûpelan. Hem ji bo xwendina çavdêriyên cihê-reng ku digihîjin kêmtirîn 180 sal beriya niha der barê civaka kurd ê kesayetên wê; û hem jî dikare bibe metnek girîng... *Samî Hêzil / R.5*

Rojnameya
Heftane

www.xwebun.org

xwebûn

25 - 31 Gulan 2020

Hejmar: 23

Buha: 4 TL

rojname@xwebun.org

Em zeviya xwe cardin şên bikin

Rojda Yaşîk jî yek ji van kesan e ku berê xwe daye helbestên cihanê û wan werdigêrîne zimanê kurdî. Ew karê wergerê wekî 'warekî têkoşînê' pênase dike. Yaşîk têkildarî girîngiya wergerê ji rojnameya me re axivî û wiha got: "Xeyal bikin ku kurdî/kurmançî zeviyek e. Lê mixabin, hin dijminên hov bi sedan salan rê û dirb xitimandine û nehiştine

hûn vê zeviyê av bidin. Zeviya we bes bi ava baranê carna şil bûye lê bi gelemperî ziha ye. Divê hûn cardin berê kanî, robarên cihanê bidin zeviya xwe. Belê kurdî mixabin ev zevî ye û werger jî kanî û robar in. Em ê bi kurdî bifikirin, biaxifin, binivîsin û edebiyata cihanê wergerînin kurdî û zeviya xwe cardin şên bikin."... *Hevpeyîna Bêrivan Kayî / RÛPEL - 4*



Cejna Remezanê pîroz be!

Ji ber nexweşiya vîrusa koronayê îsal welatiyan Cejna Remezanê li malên xwe pîroz kirin. Gelek rêxistinên kurdan daxuyanî dan û cejna gel pîroz kirin. Li bakurê Kurdistanê goristanên ku her sal beriya cejnê bi girseyî dihatin ziyaretkirin, îsal ji ber qedexeya derketina derve vala man. Li Amedê 12 siyasetmedarên kurd hatin girtin û Dilgeşê 3 salî li korîdorên dadgehê cejn pêşwazî kir û tevî dayika xwe Gonul Aslan hat girtin... *RÛPEL - 3*

Jenosîda bîra civakî

Êrîşên li ser goristan û miriyên kurdan, nîşana hêz û bandora miriyan a li ser civakê ye. Bi mirinê re tenê jiyaneke nîvco namîne, têkoşîna mirî jî nîvco dimîne û ev yek jî berdeyamkirina wê têkoşînê li ser yên mayî ferz dike... Termê ku li axê tê veşartin, hikmê xwe jî li ser axê ferz dike. Anku veşartina termê li axê, kolana hafizeyê ya li ser axê ye. Lewma êrîşên li ser goristanan jenosîdeke li dijî hişûbîra civaka kurd

E... *Derya Aydın / RÛPEL - 8*



Cejna meha paşîv û berbangê...

Mehk ku me dike şahidê şevê derbas bû. Şahidî û raza şevê, rewşeke cuda û xweş e ji bo yên vê 'meha rojîyê' bi şiyariya şevê ango dema paşîvê dijîn. Şev şahid e ji me re. Bi bêdengî û aramiya xwe şahidê me ye. Me dibîne, em jî wê dibînin, ji xewê me şiyar dike, em jî wê şiyar diborînin. Şev me şiyar dike ji bo hêviyê nû, ji bo dîtina berbangê. Şeva şahid dixwaze em şiyar, bi hêvî û li ser piyan berbangê bibînin... *Dilan Aydın / R. 7*

Ber bi yekitiya neteweyî ve


Li Rojava partiyên ku di nav rêveberiya xweser de cih digirin gaveke girîng avêtin û bi navê Partiyên Yekitiya Nîştîmanî ya Kurd ava kirin. Bi tevahî 25 partî hatin hev û ev enî ava kirin. Ji nûnerên van partiyên wê 7 kes bîna hîlbijartin û wê bi 7 kesên ku ji ENKS'ê bîna hîlbijartin re li ser hêla leşkerî û rêveberiyê hevdiîtan bikin. Wê lihevkerîna li vir bandorê li parçeyên din ên Kurdistanê jî bike... *RÛPEL - 3*

Li Adigeyê hebûna kurdan

Kurdên li Komara Xweser a Adigeyê ya girêdayî Federasyona Rûsyayê dijîn bi zor û zehmetiyên pir mezin re rû bi rû dimînin. Wek li her derê jî bo kurd nebin xwedî yekitiyê û nebin hêz dewleta tirk li vê herêmê jî dixwaze gelê kurd perçe bike û bê tifaq bihêle. Dixwaze vê yekê jî bi avakirina hin komîteyê ndijberî kurd û bi hin neteweyên li herêmê jî hebûna kurdan acizin pêk bîne. Di vê çarçoveyê de ji bo sazîyên kurdan bîna girtin jî xebateke mezin ya lobiye tê meşandin... *Felemez Ulug / R.6*

"Şevêk Şîzofren" Tirsê Bi Êşê Dinixumîne

Ji destpêka mirovahiyê heta vê serdemê afirandin piştî êşekê dest pê dike. Ji figurên li şikeftan bigirin heya berhemên hunera modern/nûjen ku em bala xwe bidinê jêderka wan yan jî bîngeha wan hemûyan yek e: Êş. Hemû berhemên sereke ku îro jî di asta "jorîn" de... *Sidar Jir / R.12*



Hunermendek ji eşîra Şadîyan

Ez nizanîm bê ajandayê nepenî ya Timûr Çelik heye yan na, ya ku pêvejo ya wî ya ji qewlê wî ve "boyaxkirinê" hildide nav xwe, lewre çî gava ez li hesabên wî yên medyaya civakî bihinêrim, çî gava ez lê bigerim û derheqê kar û barên wî yên hunerî de pirsên axîretê jê bikim... *Şener Özmen / R.11*

Teoriya medyaya femînîst

Linda Steiner

Femînîzm li dijî desthilatdariyê û mêtîngîyê, fikra azadî û tevgera veguherîne diparêze. Femînîzm têgeheke gîrecan e û armanca li vir niqasha qatîdeyên ku nirx tê de hene nîne û di vî nivîsê de pênasîkirina teoriya medyaya femînîst bi tena serê xwe nikare têgeha femînîzmê ji nişan bide. Heke mirov mîna keçe şênber bide, medyayên femînîst ji hêla femînîstan ve hatine sazîkirin û nirxên femînîzmê û geşedanên medyaya femînîstan nişan dide û naveroka medyayê jî li vir ne mecbûr e ji xeta çanda femînîzmê pêk b. Di platformên medyayê de bikaranîna ziman ji aliyê rêgez û bikaranîna têgehên femînîstan ve nêzikatiyên jinan nişan dide. Naveroka wan femînîst nebe jî nêrîn û bikaranîna ziman femînîst e. Hêz di destê jinan de ye. Polîtîkayên xwe venasêrîn û lêkolînên wan ên rojeva femînîstan û armanca wan jî vî nişan dide. Bi rastî teoriya medyaya femînîstan ji derveyî cudahiyan zayendê, zayenda civakî esas digire. Nasname û tecrûbe li gorî zayenda civakê form digire û têkilîyên wê yên desthilatdaran jî tîn nîrandîn. Zayend li vir jî hêla civakê ve tê inşakirin. Mirov dikare bêje ku zayend çêkirî ye û wek xwezayî tê nîşandan. Pirsîrêkên medyayê jî di navenda niqasha femînîzmê de xuya dibê. Bi vî awayî niqaşên hişk ji carna derdikevin holê. Ji hev cudatir çend heb teoriyên femînîzmê derbikêvin jî heta niha li ser medyaya femînîst ramanê hevpar dermektîye.

Dîroka aktîvîzmê

Dîroka medyayên femînîst bi pirtûka Betty Friedanê ya *The Feminine Mystique* (Tesewîfa Jinwarî) ê destpê dîke. Ev pirtûk di sala 1963'yan de sîleyekê kovarên populêr ên jinan (ku rêveberî di destê mîran de bû) dixê. Jinên ku di van kovaran de dixebitîn wek newrotîk û nebextiyar dihatin nîşandan û bextewariya jinan jî wek jina malê yan jî bi dayîkbûnê ve dihat girêdan. Lê dîsa jî Betty Friedan wek Donna Allenê bi bandor nîne û pêşengiya Allen wek mîrate ji bo pêşerojê dimîne. Donna Allen aktîvîstek e û

azadiya sîvil û aşîtiyê diparêze. Di sala 1972'yan de Enstîtuya Azadiya Çapemeniyê ya Jinan (WIFP) ava dîke. Dozên li hemberî weşanên jinan hatine vekirin dişopîne, li ser zextên polîtîkayê disekine û hewl-daneke zagonî dide û li gorî wê jî raporên amade dîke.

Di sala 1977'an de Donna Allen û keça wê Dana Densmore di manîfestoyên xwe de bang dikin. Ji bo felsefeyê ragihandinê jî bo hemû mirovahiyê nêzikatiyê aşîxwaz û di hêla polîtîkayê de jî daxwaza wekhevîyê destnîşan dikin. "Ji bo pêşveçûna jinan pêdiviyek heye ku ji derveyî sazîyên jinan, jinên ku di sazîyên mîran de dixebitîn jî heye. Jin divê di sazîyên wiha de şaşîtiyê û berevajîkirina mîran sererast bikin."

Allen û keça wê ya duyemîn Martha Leslîe Allen jî bo rojnâmegegeriyê femînîst 3 rêbazan diyar dikin: Teqez êrîş nekin, ji bo axaftina mirovan destûrê bidin û rojnâmegeriya mîran red bikin.

Wê demê femînîzma lîberal hêdî hêdî berbiçav xuya dibû û jî hêla Enstîtuya Azadiya Çapemeniyê ya Jinan (WIFP) ve hinek dane dihatin tomarîkirin: Di televîzyon an jî filman de rîstên zayendiyê şaş nîşan didin an jî qet cih nadin jinan. Komîsyona Mafê Sivîlan a DYA'yê di raporeke xwe de balê dikişîne ser, di rêzefîlm û nûçeyan de temsîliyeta kesên rengdar ku zêde di medyayê de nayên nîşandan. Li gorî komîsyonê hinceta wê rewşê jî kesên rengdar û jin zêde xwe nîşan nadin û jî bo rêveberiya sazîyên medyayê jî kêfxweş nînin. Ji ber wan sedeman di medyayê de temsîliyeta wan jî tîrî wan nake. Di raporê de herî zêde balê dikişînin ser girîngiya televîzyonan.


[Televîzyon] li ser kesan û koman agahî dide mirov. ... Ji temaşevanan re agahdariya, kî çî ye û çawa ye parve dîke. Bi rêya televîzyonê kesên xuya dikin balê dikişînin û eleqeyek li ser wan kesan e. Kesên di televîzyonê de xuya nakin, mirov dikare wan tune jî bihesibîne. (Komîsyona Mafê Sivîlan a DYA'ê, 1977)

Bi gelemperî ev analîzên daneyan, hem jî bo zayendperestî û hem jî di qada medyayê de pirsîrêka îstîf-

dama jinan derdixê holê. Li aliyekî din jî di hêla xwegiramiya jinan de bandoreke neyînî derdikeve pêşberî mirovan. Nêzikatiya "mîtolojiya" tevgerên femînîst ên salên 60-70'yan wan doran jî aliyê Marjorie Ferguson ve xedarane tîn pûçkirin. Ferguson dîsa daxwazên hevpar dubare dîke; ji bo hêzgirtinê di medyayê de xuyakirina jinan, wekhevî, di sazîyên medyayê de asteke bilind de temsîlkirina jinan û hwd...

Bi kurtasî sîpela duyemîn a teoriya medyayên femînîst di esasê xwe de teswîra jinan bi serweriya mîran ve girêdide. Teswîrkirin li vir rola zayend, netewe û çîn (pol) diyar dîke. Jin di lêgerîna li derveyî kar û xebatên kevneşopîyê de bibin jî dîsa jî pêşveçûna wan jî hêla mîran ve bi-hata astengkirin. Dîsa jî teorî li vir bandorên erênî yên jinan ku sazîyên medyayê de cih girtine pêş dîtiye. Li vir tenê îstîsnayek heye ku ew jî ew e ku jinên di sektora reklamê de dixebitîn. Di sektora reklamê de jî bo kêfxweşîya mîran bi nîşandayîna her parçeyê laşê jinan (lêv, çimik, pêşîr) ve, jinan heyberî dikin (wek meta-yekê nîşan didin) û wek tiştêkî seksûel nîşan didin. Bi her du awayî jî jin tim di nav hesta metirsiyê de dimînin. Nêrînen medyayê tim bi nêzikatiya îdeolojiya desthilatdaran ve tîn îfadekirin û ev tişt jî di pêşberî pêşveçûna hişmendî û gihandina kesayetê de pirsîrêkên mezî derdixin holê. Nêrînen wiha ne teqabulê rasteqîniyê ne û li derveyî rasteqîniyê dimînin. Lê mirov dikare bêje ku wek formên çandî hatine inşakirin. (Rakow, 2001; Van Zoonen, 1994) Gaye Tuchmanê (1978) jî bi wê rewşê têgeha hêmayî (sembola) îmhayê bi kar tîne. Di Zanîngeha Birminghamê de Koma Lekolîna Jinan (1978) tecrûbeyên çandî yên jinan dadihurînin û li ser çawa zayenda qadên çandî diyar dikin, disekin. Teorîsyenên filma femînîst, bi rêya zayenda civakî beralîkirina nêrîna temaşevanan tespît dikin û bi vî awayî jî jinan wek kesên dîtîr (Other) pênasî dikin.

Laure Mulvey (1975) jî bo îzahkirina dîtîna dinamîzma zayenda civakî, teoriya şîtelkariya derûnî (psychoanalytic) bi kar tîne û nêrîna



mêrê Hollywoodê teşîr dîke. Wek nîşaneyê felsefeya Allen, daneyên medyaya nûçe çendaniyê (quantitative, nicel) bû. Di televîzyonê de çend akademîsyen, bijîşk an jî parêzer jin bûn? Di bernamîyên zarokan de çend keçîkan cih digirt? Di rûpela yekemîn de çend heb nûçe yên jinan bûn? Her çîqas bi xêrxwazî ev xebatên bijartinê pêk bînin jî dîsa jî xebatên wan xav diman. Tinazwer e ku dîsa jî lêkolîna çendaniyê ya teoriya medyayên femînîst kêma dihat dîtîn û jî ber vî dihatin sûcdarkirin. Wê gavê jî hêla Tuchman ve jî nêzikateyê ecêb derdikeve holê. Tuchman bi guman nêzikî lêkolîneran dibe û wan wekî ku akademîsyen in sûcdar dîke. Lê ew sûcdarkirin adilane nîne. Qet nebe wê demê femînîstan jî bo lêkolînê nikaribûn budceyekê terxan bikin (tahsîskirin). Di xebatên medyayê de lêkolîneran dane-yên ewle kom dikirin ku xwediyê statuyê baş bibin. Rexneyên çawanî (qualitative, nîtel) û sûda şîroveyan pir zêde berbiçav nebû. Ji ber wê xebatên daneyan herî zêde bi rêbaza

çendaniyê ve dihat domandin. Lê dîsa jî bi tena serê xwe daneya çendaniyê bikêrhatî bû. Even Gallager vîya wek paradoksê nîşan dide:

"Li ser naverokê niqaşîkirin xetereyekê derdixê holê ku ew jî îhtîmala qelsdîtîna sazîyên medyayê ya femînîstan e. Lê analîzên naverokê nekin jî, ji bo aktîvîstan hinek pirsîrêk derdikevin holê. Analîzêke xurt neyê kirin ji bo veguherîneke erênî ew ê nikaribin stratejiya pêşveçûnê derbixin. Bi her awayî jî şînkirina teoriyê qels dimîne." Di salên 1966'an de jî aliyê Freidan û yên din ve sazîyêk tê avakirin, Rêxistina Jinan ya Neteweyî (NOW). Ev rexistin hê jî hîpotezên wiha li hemberî televîzyonê pergale bi kar tîne. Di sala 2002'yan de jî bo îfşakirina têgehên zayendperest, nijadperest û hwd. naveroka torên medyayê "dijmîrin." Di nav wan de efsaneya rêveberiya cîhanê di destê mîran de ye û sîdwergerîna muna-sebêta cînsî ya jinan hene.

Têbînî: Ev nivîs ji îngilîzî hatiye wergerkirin.

Stran û kilam carnan bûne dengê êş û kederên me, carnan jî bi rengê serpêhatî û gotegotan hatine, mîna ava geliyan xwe li deşt û zozanên wetlatê me dane û herikîne. Gelek caran bûne stîrî û xwe li bibilkên çavan xistine, bûne bar li ser piştê çavan û xwe di hinarokan de berdane.

Stran nalînên me jinan in, lorînên ku me li her ber destê sibehan ew bi hilanîna rojê re dişîstî. Êvaran ew di pexela xwe de radizandin, lê ma pêkan bû ku aram bin! Na, ne pêkan bû dema ku wiha dikelijîn êş di qirikan de...

Niha jî lajeya 'Mercan' e di sînga jinan de lê dixê û kezêban disojîne, ranazîna dema bixwe wiha hişyar û bîqerar dîke. Taqet lê nemaye!.. Çendîng deng tîkelê hev bûne; ez dibêjim bi dehan deng in, dengê bi dehan êş, keder, dilsojî û kezêbreşiyên jinan... Çawa jî olan dide û zimezimê bi guhan dixê û xwe li reşahiya şevan diale, heya neqelîşîne, bêhnê lê nede girtin jî heneseyek kûr nakîşîne. Hîngê aram e, dema ku dengê bi dehan jinan li gel dengê wê dibe yek...

Niha çawan jî deng lê ketiye; bi qasî aramiyê ewqas jî bi hawarê dinale û dilan dişewîtîne, tu yê bêjî roj roja mehşerê ye ku min wiha disojîne, wexta birînan dikemilînim û ew birîneke din li sînga min zêde dîke.

Vaye jî te re lajeyêke din, lajeyêke ku serê zîmanê jinan qetiyayê û ber bi te ve hembê-



Zehra
Mohammadzadeh

zên bi êş vedike:

Strana 'Mercan' a ku hawara êş û kederên jinan e, yek ji stranên xemgîn a herêma bakurê Xorasanê ye. Ew jî vedigere çaxa Rîza Şah ku cendirmeyên herêma Çînarî gelek kiryarên hovane dikirin. Rojê jî wan rojan cendirme dîsan xwe berdidin dorhêla gundên navbera Qoçan û Çînarî, li wir rastî jina kurd a bi navê Perîşan û keça wê a nûciwan Mercanê tîn. Cendirmeyên Rîza Şah çawa ku Perîşan û keça wê dibînin êrîş dikin û desdavejî wan. Perîşan ku taqeta rakirina vî bûyerê nîne, di vegeerê de rûyê qîza xwe Mercanê maç dîke û wê dişîne cem bavê wê ye bi navê Merdan. Her wiha jê re dibêje, ji bavê xwe re bibêje bes ku bê taqet bûye, nekariye bimeşe û xwe bigihîne wir. Ew piştî ku qîza xwe dişîne cem bavê wê, kêrekê dixê sînga xwe û li şûna vî "jiyana bê şerm", mirîne hildibêjere, bi vî rengî dawî li jiyana xwe tîne.

Dema gundî cendekê mirî yê Perîşanê dibînin, sond dixwin ku heyfa wê hildin, ji bo wê jî dest ji kar û barê xwe berdidin, dikevin pey cendirmeyên çav sor. Di encama şopandîneke dîv û

'Mercan'

dirêj de, ew du cendirmeyên gunehkar digirin û dikujin. Dûvre Merdan tevî qîza xwe Mercanê xwe dispêrên çîyayan. Heya çend mehan dîr ji çavên hêzên dewletê; ku li her deverêkê li pey wan bûn û dixwestin wan bigirin, dijin. Ew di dema cejna Newrozê de bi awayekî weşarî tîn mala yek ji hevalên xwe û dixwazin li wir cejna xwe pîroz bikin. Bi wesîleya cejna Newrozê Merdan kirasekî nû ji qîza xwe Mercanê re dikire û li wê dîke. Hêzên dewletê yên ku li her deverêkê û her tim li pey wan bûn, hay ji cîhê ku ew lê ne çêdibe. Di kêliya ku Mercan û bavê xwe li ber tenûrê xwe germ dikirin de, cendirmeyan dest avêt çêkê û berê guleyan dan ser Mercanê. Wan dixwest Mercanê li ber çavên bavê wê bikujin. Ji bo wê, ewil Mercan ku li kêleka bavê xwe rûniştibû kirin hedef û bi guleyekê ew kuştin. Mercan ku li kêleka tenûrê rûniştibû, bi guleya xayîn a lê ketibû, ket tenûrê. Merdanê bavê wê heya ku hay ji xwe bû, gule wek baranê di ser wî de jî hatin... Merdan gulebaran kirin û ew jî ket tenûrê û bi vî rengî bav û keç di hembêza hev de, di tenûrê de sotin. Nalênala bav û keçê jî

bû hawar û fiğana tevahiya gundî..

Mirina vî keça civan Mercan û bavê wê, nexasî jî diya wê ya bi qeyret Mercanê ewçend li ser gelê herêmê bandor kiribû ku bi salan ev bûyer jî ser zîmanê wan neket. Humermend û stranbêjan şîr girêdan û jî devê bavê wê Merdan ku di kêliyên dawîya jiyana xwe de dilorand, helbest û stran çekirin ku strana 'Mercan' jî yek ji wan e.

Bi vî rengî nalîna Perîşan û keça wê Mercanê di nav herikîna demê de dibe dengê hemû jinan û heya roja me ya îro tî. Êş û kederên wan dibin xem û xwe li wechê hemû jinan dixin, carnan jî wek girêyêke kûr xwe li qirîkê asê dîke... Bi êşê be jî bi wan bîr dixê ku ew xwedî yek dengî ne û kes nikare vî dengê wan ku carnan biêş, dilêş û kezêbreşî be jî, tîkê bibe.

Ev stran heya roja îro jî tî gotin. Bi taybetî jî ji aliyê Şadrowan Îsmayîl Starezadeh Qoçanî ve bi du zîmanan, kurdî û farsî hatiye xwendin:

*Mercan, Mercan keçikê min
Yadgarî jîneke min
Li xwînî mayî keçikê min
Keçika min a Çînarî
Gula sojîzî li Demanî
Tendûreyî Kelo Elî
Hestî goştî te lê kelî
Herayê lê kelî...*

Li benda mirina wî bûn!

Girtiyê nexweş Sabrî Kaya ku 30 caran rakirin nexweşxaneyê û nedihat berdan, jiyana xwe ji dest da. Piştî ku hat fêmkirin wê Kaya jiyana xwe ji dest bide, beriya mirina wî bi çend saetan biryara berdana wî dan

Navenda Nûçeyan

Li girtîgehên Tirkîyeyê bi sedan girtiyên nexweş hene. Ji bo balkişandina ser rewşa van nexweşan, her hefte çalakî tîn lidarxistin û tê daxwazkirin ku girtî bîn berdan. Lê hikûmet van çalakî û daxwazên ji bo berdana girtiyên nexweş paşguh dike û ne girtiyên nexweş berdide ne jî bi rêk û pêk wan tedawî dike. Ji ber vê helwesta hikûmetê, girtiyên nexweş li girtîgehên jiyana xwe ji dest didin û cenazeyên wan ji malbatên wan re tên şandin. Girtiyê nexweş Sabrî Kaya jî yek ji van girtiyên bû ku di 22'ê gulanê de li Nexweşxaneyê Balcali ya Fakulteya Tipê ya Zanîngeha Çûkûrovayê hatibû kirin. Serdozgeriya Komarê ya Osmaniye, li ser rapora Nexweşxaneyê Dewletê ya Osmaniye, beriya ku Kaya jiyana xwe ji dest bide bi çend saetan biryara berdana wî dabû. Kaya, di hevdîtina telefonê ya 6'ê gulanê ya bi malbata xwe re kiribû, bal kişandibû ser rewşa xwe û wiha gotibû: "Edî hêza min a li ber xwe bidim nemaye. Ez ê bimirim."

her sê caran de jî hatibû gotin ku "Rewşa wî baş e" û careke din ew şandibûn girtîgehê.

'Ez ê bimirim'

Nexweşxaneyê Dewletê ya Osmaniye jî bo Kaya, di 20'ê gulanê de rapora "nikare di girtîgehê de bimîne" dabû. Lê Kaya, di heman rojê de sewqî Nexweşxaneyê Balcali ya Fakulteya Tipê ya Zanîngeha Çûkûrovayê hatibû kirin. Serdozgeriya Komarê ya Osmaniye, li ser rapora Nexweşxaneyê Dewletê ya Osmaniye, beriya ku Kaya jiyana xwe ji dest bide bi çend saetan biryara berdana wî dabû. Kaya, di hevdîtina telefonê ya 6'ê gulanê ya bi malbata xwe re kiribû, bal kişandibû ser rewşa xwe û wiha gotibû: "Edî hêza min a li ber xwe bidim nemaye. Ez ê bimirim."

Ji sala 2010'an ve girtî bû

Kaya, bi hinceta ku tev li bûyereke ku di sala 1998'an de pêk hatiyê bûye, di sala 2000'î de li navçeya Ceyhanê ya Edeneyê hatiyê binçavkirin. Ji bo dosyeya wî biryara neşopandinê tê dayîn. Piştî li ser îfadeyên îtirafkerê Kaya, careke din tê binçavkirin û cezayê girtîgehê lê tê birin. Kaya, ji sala

2010'an ve di girtîgehê de bû. Di sala 2013'an de jî ber rewşa wî ya tenduristiyê, înfaza wî jî bo sê mehan tê rawestandî. Piştî Saziya Tiba Edlî dibêje nexweşiyên wî tunene û careke din tê girtin.

Ev wijdaneke çawa ye?

Biraziye Kaya Serhat Kaya, der barê rewşa apê xwe de axivî û diyar kir ku apê wî di encama xemsariya rayedarên de jiyana xwe ji dest daye û bi van gotinan bertek nîşanî xemsariya dewletê ya li hemberî apê xwe da: "Piştî ku apê min mir, bir-

yara berdana wî dan. Ev wijdaneke çawa ye? Li benda mirina wî bûn. Ji bo apê min serî li Dadgeha Destûra Bingehîn hat dayîn. Lê hat redkirin. Piştî vê redkirinê rewşa apê min hê bêtir xera bû. Li ser vê yekê biryara berdana bi şertê sê mehan hat dayîn. Ji bo apê min mudaxleyên pêwîst nehatin kirin. Ev pêvajoya mirina wî zanebûn hat birêvebirin."

Ji ber gumana vîrusa koronayê cenazeyê Kaya nedan malbata wî. Piştî kirina testa vîrusê, cenazeyê Kaya, li Goristana Asrî ya Ceyhanê hat veşartin.



Di rojên koronayê de cejn

Ji ber nexweşiya vîrusa koronayê (Covid 19) îsal di Cejna Remezanê de welatî li malên xwe man û her wiha bi rêya amûrên raqihandinê cejnên hevdu pîroz kirin. Bi boneya cejnê gelek sazî û rêxistinên kurdan daxuyanî dan û cejna gel pîroz kirin.

Gelê Bakur û Rohhilatê Sûriyeyê, bi boneya Cejna Remezanê, di saetên serê sibê de berê xwe dan goristanan û kesên di têkoşîna azadiyê de jiyana xwe ji dest dan bibîr anîn.

Kongreya Civaka Demokratîk (KCD), bi minasebeta Cejna Remezanê peyamek weşand û cejna hemû alema îslamê û gelê Kurd pîroz kir. KCD'ê di peyama de wiha got: "Em cejna Remezanê ya alema îslamê û hemû gelên xwe pîroz dikin û dixwazin bibe wesîleya aşîtiyê, aramî û demokrasîyê. Kongreya Îslama Demokratîk (KID), bi cejnê peyamek weşand u xwest cejn bibe wesîleya edalet, azadî, vejîn û rapêrîna mirovahiyê. AMED

Ji bihara ereban ber bi yekitiya kurdan ve

Qedrî Esen

Aloziya li welatên ereb ku weke "Bihara Ereban" hat binavkirin, di sala 2010'an de dest pê kir û hê jî didome. Ev alozî û serhildanên li dijî diktatorên welatên ereb, li welatên mîna Misir, Lîbya, Tûnûs, Sûriye, Bahreyn, Cezayîr, Urdun û Yemenê gelek guhertin bi xwe re anîn. Bi taybetî jî li Misir, Lîbya, Sûriye û Yemenê bû sedema encamên gelek giran.

Li gel ku li Misir û Lîbyayê diktatorên bi salan ên li ser desthilatê tîk çûn jî aloziya li van her du welatan hê jî bi dawî nebûye û şerê desthilatê li wan didome. Li Misirê kêrî lî Lîbyayê jî ber destwerdana Tirkîyeyê asta şerê desthilatê gelek bilind e. Yemen û Sûriye jî ji ber vî aloziyê dabeş bûne. Şerê navxweyî yê li van her du welatan hê jî didome û alî bi ser neketine.

Bi hêz bûn û qels ketin

Ji ber hebûna wan, şerê navxweyî yê Sûriyeyê jî nêz ve kurdan

eleqedar dike. Şerê navxweyî yê Sûriyeyê, di sala 2010'an de dest pê kir. Lê di sala 2011'an jî ber destwerdana hêzên navneteweyî û hêzên herêmî asta şer gelek bilind bû. Muxalefeta Sûriyeyê ya ku destpêkê xwepeşandan li dar dixistin, piştî vî destwerdanê li dijî rejîmê şerê çekdarî da destpêkirin.

Hêzên paramîlîter ên îslamîst hatin avakirin û gelek deverên Sûriyeyê jî rejîmê girtin û kirin bin kontrola xwe. Lê piştî ku di sala 2015'an de Rûsya daxilî şerê navxweyî yê Sûriyeyê bû û piştîgirî da rejîmê, hevsergiya şer guherî. Ev hêzên îslamîst qels bûn û li gelek deveran li hemberî hêzên rejîmê û Rûsya yê tîk çûn. Bi peymanan gelek deverên di destê xwe de ji rejîmê re hiştin.

Berê xwe dan herêma kurdan

Li Sûriyeyê kurd stratejîk tevgeriyar û nebûn aliyê şerê navbera rejîmê û komên îslamîst ên bi kontrol. Ji ber vî stratejiya xwe kurdan hem rojavayê Kurdistanê û hem jî beşeke mezin a bakur û rojhilatê Sûriyeyê bi berdelên gelek giran parastin. Li

dijî DAIS'ê şerê gelek dijwar kirin û bi hezaran mirov ji koletiya DAIS'ê rizgar kirin.

Piştî tîkçûna xwe ya li hemberî rejîmê, komên îslamîst bi piştigirîya Tirkîyeyê berê xwe dan bakur û rojhilatê Sûriyeyê yê di bin kontrola kurdan de. Tirkîyeyê, di serî de Efrîn hin herêmên Bakur û Rohhilatê Sûriyeyê dagir kirin. Herî dawî jî di dawiya sala 2019'an de bi wan bajarên Grê Spî û Sêrêkaniyê yê Bakur û Rohhilatê Sûriyeyê dagir kirin.

Yekitî ferz bû

Ji ber tunebûna yekitiya kurdan dagirkeriya li ser xaka rojavayê Kurdistanê bi pêş ket. Tirkîye jî vî tunebûnê sîd werdigire û dixwaze dagirkeriya xwe ya li ser Bakur û Rohhilatê Sûriyeyê kûr bike. Ji bo ku parçebûna di navbera kurdan de bê mehkûmkirin û neyarên kurdan jê sîd wernegirin, Fermandarê Hêzên Sûriyeyê Demokratîk (QSD) Mezlûm Ebdî înisîyatîf girt.

Fermandar Mezlûm Ebdî, dema pêvajoya dagirkeriya Grê Spî û Sêrêkaniyê bang li rayedarên ENKS'ê kir û jî wan xwest ku pê re hevdîtin bikin û yekitiya neteweyî pêk bînin. Li ser vî înisîyatîfa Mezlûm Ebdî, di navbera ENKS û TEV-DEM'ê de gelek hevdîtin hatin kirin. Herî dawî jî Amerika û Fransayê jî piştigirî da vî înisîyatîfa Mezlûm Ebdî û dan û standina di navbera ENKS û TEV-DEM'ê de zedetir kirin.

Partî hatin gel hev

Piştî çend hevdîtînan di navbera tevgerên kurd hatin kirin, nêzî yekitiyê bûn. Li gorî agahiyên ku di dezgehên çapemeniyê de tên parvekirin

aliyan heta astekê li hev kiriye û di hêla siyasî de gihîştine encamê. Lê tî gotin ku di hêla leşkerî û rêveberiyê de hê hevdîtînan di navbera aliyên de berdewam dikin û xwe negihandine encamê.

Di nav hefteyê de gava herî şênber a vî yekî jî aliyê partiyên ku di nav rêveberiya xweser de cih digirin ve hat avêtin û bi navê Partiyên Yekitiya Niştîmanî ya Kurd eniyek ava kirin. Bi tevahî 25 partî hatin gel hev û ev enî ava kirin. Ji nûnerên van partiyên wê 7 kes bîn hilbijartin û wê bi 7 kesên ku jî ENKS'ê bîn hilbijartin re li ser hêla leşkerî û rêveberiyê hevdîtînan bikin.

Bandora yekitiyê

Tê gotin ku Amerika û Rûsya yê li ser çareserîya siyasî ya Sûriyeyê li hev kiriye û dixwazin ku edî aloziya Sûriyeyê bê şer çareser bikin. Heke kurd li Bakur û Rohhilatê Sûriyeyê li hev bikin û yekitiya neteweyî pêk bînin dê di çareserîya siyasî de cih bigirin û statu bi dest bixin, na heke nakokiyên xwe bidomînin dê çareserîya wan li gorî daxwazên Amerika û Rûsya yê be.

Wê lihevkerîna li vir bandorê li parçeyên din ên Kurdistanê jî bike. Pêkan e ku li her çar parçeyan jî nakokiyên li ser yekitiya neteweyî yê di navbera partiyên kurdan de bi dawî bikin. Wê ev lihevkerîna di heman demê de planên dewletên cîran ên li ser kurdan jî vala derxe û destê kurdan li hemberî wan xurt bike. Kîjan aliyê kurd bibe sedema tîkçûna vî hêza yekitiya neteweyî û kurdan li hemberî hêzên serwer qels bike, wê kurd wî aliyê tu caran baş bi bir neynin.



Li dadgehê cejn pêşwazî kirin

Li Amedê di 22'ê Gulanê de bi fermana Serdozgeriya Komarê ya Amedê di nav rêveberên Komeleya Jinan a Rosa, aktivîstên Tevgera Jinên Azad, Dayikên Aştiyê û rêveberên KCD; HDP û BDP'ê jî di nav de 18 kes hatin binçavkirin. Kesen ku hatin binçavkirin piştî li midûriyeta polîsan lîpîrsîna wan hat kirin, sewqî dozgeriya Amedê kirin.

Dadgehê der barê Seroka Komeleya Jinan a Rosa Adalet Kaya, rêvebren Komeleyê Narin Gezgor Fatma Gultekin, aktivîstên TJA'yê Gulcihan Şimşek, Hevserokê DBP'ê yê berê Mehmet Arslan, Endamê Navenda HDP'ê Ozlem Gunduz, Hevseroka HDP'ê ya Navçeya Yenîşehîrê Remziye Sızıcı, Endamê Meclîsa Şaredariya Rezanê Gonul Aslan û Veysi Kuzu, Endama Meclîsa Şaredariya Amedê Sevim Coşkun, Endamê HDP'ê Mehmet Ali Altinkaynak, endamê DBP'ê Celal Yoldaş de biryara girtinê da û ew şandin girtîgehê. Kurê endama Meclîsa Şaredariya Baglarê Gonul Aslan, Dilgeşê biçûk jî li gel parlamenterên HDP'ê li benda biryara ji bo dayika xwe heta nivê şevê sekinî. Haya wî jî cejnê tune bû lê xema wî dayika wî bû. Hevseroka KCD'ê Leyla Guven got kurd rojên cejnê û rojên taybet ne li gel zarokên xwe li korîdorên dadgehan cejnê pêşwazî dikin. AMED



KURDÎ ZEVÎ YE WERGER KANÎ Û ROBAR E

Wergêr warekî têkoşînê ye

→ Bêrivan Kayi

Xeyal bikin ku kurdî/kurmancî zevîyek e. Lê mixabin, hin dijminên hov bi sedan salan rê û dirb xitimandine û nehiştine hûn vê zeviyê av bidin. Zeviya we bes bi ava baranê carna şil bûye lê bi gelemperî ziha ye. Divê hûn car din berê kanî, robarên cihanê bidin zeviya xwe. Belê kurdî mixabin ev zevî ye û wergêr jî kanî û robar in. Em ê bi kurdî bifikirin, biaxivin, binivîsin

Rojda Yaşîk kî ye?



Di sala 1991'ê de li gundekî navçeya Qulpê ya Îdirê hatiye dinê. Li Qersê dibistan xwendiyê. Li Stenbolê di Zanîngeha Yildizê de mamostetiya zimanê Îngilîzî xwendiyê. Paşê li Bazîdê mamostetî kiriye. Ji ber cezayên siyasî lê hatiye birîn ji mamostetiye îstîfa kiriye û berê xwe daye Almanyayê. Niha karê wergêrî, edîtorî û pêşkêşvaniyê dike.

Her diçe pêdiviya xwendevanên zimanê kurdî bi xwendina helbest û pirtûkên biyanî yên li kurdî hatine wergerandin derdikeve holê. Îro xwendevan dixwazin hemû berhem û metnên wêjeya cihanê, helbestên cihanê û felsefevanên cihanê bi kurdî jî bixwinin. Rojda Yaşîk jî yek ji van kesan e ku berê xwe daye helbestên cihanê û wan werdigerîne zimanê kurdî. Ew karê wergêrê wekî 'warekî têkoşînê' pênase dike.

Rojda Yaşîk çi wextê û çima dest bi karê wergêrê kir? Heta niha wê kîjan berhem wergerandine kurdî?

Wekî zêdepariya zarokên kurd min jî di zaroktiya xwe de ji bo kalik, pîrika xwe wergeriya devkî her dikir. Dikarim bibêjim, karê min ê simûltane yê yekemîn wergera rêzefilmeke tirkên bû. Ez digel pîrika xwe rûdiniştim û min yek bi yek werdigerand. Lê wergera nivîskî, piştî qedandina lîseyê dest pê kir. Min di lîseyê de beşa zimanê Îngilîzî hilbijart; ji ber ku kêmîtir wane hebûn û zêdetir dem ji bo xwendinê dima. Her wiha min dizanibû heke Îngilîzî hîn bibim, ez ê bikaribim deriyê alemeke din jî vekim. Lê piştî demekê min dît ku ez dixwazim helbestên Anne Sextonê, Anne Waldmanê, Allan Ginsberg bi dengên kurdî bibihîzim. Bi rastî bersiva vê pîrsê ya baştirîn ew e ku ez heyrana dengê kurmancî me. Heta tiştek bi dengê kurmancî nekeve guhê min, nikarim bibêjim "erê bû, min fêhm kir."

Min heya niha ji zimanê Îngilîzî gelek helbestên Anne Sexton, Anne Waldman, Allan Ginsberg û Christina Rossetiyê wergerandine. Her wiha min gelek çirokên Jack London wegerandine û ez dixwazim wan hemûyan bixwînim û wekî audio-pirtûk parve bikim. Û niha li ser "Before Adam" romana Jack London dixebitim. Wergêr ber bi xelasbûnê ve ye. Hêvî dikim karekî baş derkeve û min nede şermê.

Ji zimanê tirkî jî min pirtûka İsmail Beşikçi ya bi navê "Kürtlerin Zorunlu İskanı" ji bo Weşanxaneyê Rûpelê wergerand. Her wiha min digel hin hevalan kovareke polîtîk a bi navê Çirûska Şoresger derxist. Min jî bo kovarê derbarê mijarên wekî dij-metinkari û femînîzmê de nivîsar dinivîsin û nivîsên hevalên din jî zimanên tirkî û Îngilîzî werdigerandin kurdî/kurmancî. Me kovara xwe heya 7 hejmaran wekî kulîlkekê bi ked û hêza xwe mezin kir lê mixabin îsal hate qedexekirin.

Tu helbestên cihanê werdigerîni kurdî û li ser qanala youtubê ya bi navê 'Helbesta Cihanê Bi Kurdî' diweşîni. Tu dikarî hinekî qala vê xebatê bikî? Zehmetiyên di wergêrê de derdikevin pêşiya te çi ne?

Me ji ber du sedeman xwest em qenaleke bi vî rengî çêbikin; sedema sereke ew e ku ez heya wergera xwe bi deng nebihîzim û tu carî kêfa min pê nayê. Min jixwe her dixwendin û ji hevalên xwe re dişandin. Lê bi saya youtubê her kes dikare guhdarî bike û şiroveyên xwe bike.

Sedema duyemîn jî; zêdepariya mîletê bakurî gava kurdî guhdarî



dikin, her tiştî fêhm dikin lê mixabin çanda me ya xwendin û nivîsandinê nîn e. Jixwe perwerdeya me ya xwendin-nûsîna kurdî nîn e. Lewma jî gava em bi deng parve bikin her kes dê bikaribe fêhm bike. Jixwe armanca me ew e ku em bikaribin haya mîletê xwe bi helbesta cihanê bikin.

Bêguman wergêr jixwe karekî pir çetin e û dibe ku karekî "nepêkan" be. Lê jixwe her metnek jî hin zehmetiyên din derdixe pêşiya wergêr. Her metnek azmûnek e.

Di jiyana Sylvia Plath û Anne Sextonê de xalên hevpar hene, di helbestên wan de jî em dikarin qala aliyên hevpar bikin? Gelo çima helbestên Sylvia Plath û Anne Sextonê?

Belê, der barê hevaltî û xwişkîtiya wan a edebî de gelekî hatiye nûsin. Meriv dibe balê bikişîne ser hevpariyên wekî helbestkarbûn, jînbûn, xwekuştin, nexweşiyên derûnî û hwd. Lê belê ya ku bala min dikişîne tişteke din e. Em li rûyê dinyayê, bi tikûtenê û heya di bedena jînbûnê de, bi qewlê Plathê xwe "di fanoseke cam de" dîl in. Hin kes wekî Allan Ginsberg, Anne Waldmanê dengên xwe bilind dikin û bi دنیا û sînorên derve re şer dikin. Lê Anne Sexton û Sylvia Plath şerekî "navxweyî" dikin. Helbesta Sextonê ya "Şerê Naxweyî" bînin bîra xwe. Ew di xwe de kûr dibin û li derfetên vegotinê yên din digerin.

Mirov her dixwazin kesan, tiştan, kirinan bi pênaseyên banal, pênaseyên lawaz bi nav bikin û derbas bibin. Ji ber ku ev yek çareseriyê hêsantir e li hemberî aloziya jiyane. Sextonê tu carî der barê jînbûn, nivîskarbûn, zayendê de bang hilnedêraye, lê helbestkariya xwe, jînbûna xwe, lezbiyenbûna xwe hûrik hûrik honandiye. Plathê der barê dayikbûn, welidandin û helbestkariyê de bang hilnedêraye lê peyv bi peyv, sembol bi sembol, di hebûna xwe de bi kûr ve çû. Ez jî vî zimanî, vê rêbazê û şewazê hez dikim.

Ji wergera Mele Mahmûdê Bazîdî û vir ve tu wergera kurdî çawa dinirxîni?

Bi rastî ez nikarim bi awayekî kronolojîk der barê wegera kurdî de binivîsim, ji ber ku zanîna min di der barê vê mijarê de qels e. Jixwe bi qasî ez dizanim ti karekî bi rêkûpêk der barê dîroka wergera kurdî de nehatiye kirin. Birêz Ergîn Sertem nivîsarek li ser vê mijarê nivîsibû, ji bilî vê nivîsarê heke berhemeke din hebe jî haya min jê nîn e. Lê pak pê dizanim ku wergêr karekî çetin e. Gelek mirov wergêrê dikin û dixwazin bikin lê mixabin gelek caran derfetên fêrbûna ji hevdu û şewirîna nîn in. Wergêrên Kawa Nemir ji bona min mekteb in. Ez ji wergêrên wî pir fêr dibim. Her wiha hewl didim ku wergêrên Ciwanmerd Kulek, Rizgar Elegez û Prîskê Mihoyî digel berhemên orjînal bixwînim û jê fêr bibim.

Xeyal bikin ku kurdî/kurmancî zevîyek e. Lê mixabin, hin dijminên hov bi sedan salan rê û dirb xitimandine û nehiştine hûn vê zeviyê av bidin. Zeviya we bes bi ava baranê carna şil bûye lê bi gelemperî ziha ye. Divê hûn cardin berê kanî, robarên cihanê bidin zeviya xwe. Belê kurdî mixabin ev zevî ye û wergêr jî kanî û robar in. Em ê bi kurdî bifikirin, biaxivin, binivîsin û edebiyata cihanê wergêrînin kurdî û zeviya xwe cardin şên bikin.

Ji bo mirov wergereke xurt bike hewce ye tîkiliya mirov bi zimanê dayikê re her tim zîndî be. Şert û mercên dîasporayê li ser tîkiliya te ya bi zimanê dayikê re û wergêrê bandoreke çawa dikin?

Ziman derya ye û mirov di wê deryayê de dijî. Ez kurdeka bakurî me û texmîn dikim hemû kurdên bakurî baş pê dizanim ku deryaya me ber bi tîkîcûnê ve ye. Ez beriya sê salan li Bayîzdê bûm, jixwe li Îdirê mezin bûm. Lê mixabin di navbera dîaspora û Kurdistanê de kêmfêr heye. Li her derê, ez alema xwe difirînim. Li Bayîzdê, ber bi êvaran ez û Rizgar Elegez derketin ger û geştê. Li Berlînê, tişteke nû wergêrînim an jî binivîsim ji xwişka xwe re dişînim û paşê em notanî "pîrepi-tikan" dikevin gilî gotinan. Yanê zimanê wergera xwe, bi tîkiliyên şexsî, bi hewldayînen şexsî di-

afirînim. Nizanim gelo ev yek ji bo wergêrên pak û baş têr dika yan na. Lê ka, gelo çi rêyeke din heye?

Weke tê zanîn di wergêrê de zimanê ku mirov berhemê wergêrîne, hewce ye mirov di wî zimanî de serwer be. Di vê mijarê de bandora bişaftinê bi çi awayî derdikeve pêşiya te?

Belê, di qonaxa wergêrê de bandora zimanên kolonyal mijareke kûr û girîng e. Ne bi tenê li bakurê Kurdistanê, li Başûr û Rojhilat jî bandora zimanên erebî û farisî li ser hevoksazî/sentaxa kurdî heye. Lewma jî wergêr di heman demê de warekî têkoşînê ye. Em dê bi wergêrên xwe ji zimanên bihêztir, zimanên emperyal û kolonyal sîd wergirin lê belê di heman demê de li pey deng, hevoksazî, gewriya kurdî/kurmancî bin. Her wiha bi min, em dema behsa wergêrê dikin, mijara me her ziman e. Lê belê ziman bi tenê xalek e, hindêk xalên din ên girîng jî hene. Bo nimûne heya kesek xwînerêkî baş ne be, ti carî nikare wergêrê edebî bike. Heya kesek nikaribe di kurdî de asayî û kêfxweşî sobalî bike, ew ê nikaribe ji zimanê Îngilîzî, rûsî an jî tirkî bigire wergêrîne ser esl û fêslê kurdî. Zêdepariya nivîskar û wergêrên me, di nav deryaya kurdî de sobalî nacin. Ew di deryaya tirkî de dijîn, karcarna tén û destên xwe hinekî jî dixin nav kurdî. Dibe ku lewma gelek pirtûkên kurdî temsarkî ne, dibe ku lewma hindêk wergêr ewqasî "wergêr in" ku tu yê bibêji hema orjînal in. Bêguman her mirov di bin bandora zimanê serdest, çanda serdest, fikrên serdest de dimîne lê divê hiç nebe em asoya xwe bi zimanên din ên biyanî, edebiyata japonî, amerîkî, îrlândî, rûsî, polonî berfireh bikin ku qelstiyên fikrî û zimanî yên tirkên rasterast împort nekin.

Weke jin û wergêreke ciwan pêşniyariyên te yên ji bo kesên bixwazin di qada wergêrê de bi pêş bixwevin, çi ne?

Min çend salan berê dest bi wergêrê kir û di rêwîtiya fêrbûnê û xwepêxistinê de hê jî her roj dixebitim. Bi rastî jî nizanim gelo ez ê bikaribim hin wergêrên baş, kêrhatî bikim an na. Lewma jî ez bi rastî û aşkere dibêjim, dibe ez nehim wergêreke serkeftî lê ez xwînerêke serkeftî me. Her wiha pir baş dizanim ku heya meriv nebe xwînerêke serkeftî, nikare wergêrên baş bike. Wergêr ne karê peyvguhastinê ye, yanê heke meriv peyv û rêzimanê di zimanan bizanibe meriv nikare rasterast wergêrê bike. Divê mirov behreya her du zimanan, hişmendiya wan, dîroka fikirîna ya her du civakan, kodên ferhengî û mitografyaya her du civakan û edebiyata bi her du zimanan bizanibe.

Wekî jinekê? Belê, ez her hewl didim ku li ser rûyê cihanê hemû derfetên hebûna xwe, zayendê û bedena xwe kifş bikin û xwe ji nû ve bifirînim. Her wiha dixwazim xwişkên min, jinên kurd binivîsin, wergêrînin, bibêjin û em pevte rê û rêbazên nû, pênaseyên nû yên jînbûn, nivîskarbûn û wergêrbûnê biafirînin.

Mêrên avis û zimanê bindest

Enes Yıldız

Divê pir hincetên min hebin ku heya ez strana Evdalê Zeynikê bibêjim û ji bîr nekim. Ji bo bikaribim, meseleya bindestiyê nîqaş bikim. Bi eşqeke mezin û ji bo xwebûna xwe serî rakim. Berdêlên giranbiha bibînim ku di doza zimanê xwe de xwedî israr bim. Divê birîna me, xewnên me, çiyayên me bi kurmançî qîr bikin û ji bo em bikaribin zaravayên din ji fêr bibin û danasîna wan her tim bidin kirin. Ne bi hiziran-dineke bindestiyê binivîsîn û ne ji hewce bibînin ku hêviyên xwe yên di oxira jiyaneke nû de bi zimanê serdestên xwe ragihînin. Heke di azadî û xeyalên mirovan de eşqa welatekî hebe, wê di her kêliyê de tîpên zikmakî di hişê xwe de vebêjin. Wê demê wek kesayet, civak û netewe, her tiştê me, wê helbet di oxira azwerî û hêviyên me de mayînde bibin.

Di zivistanekê de û di sibatekê de birîneke kûr hênîk nabe. Mirîyên xewnekê, li xwe hişyar

nabin. Qertel, teyrikên payizekê, qulingên li yek esmanî û li ser welatê me ku difiriyan. Hîna ji baskên xwe tîn qedexekirin, ji zimanê xwe bêpar in.

Maskeyên xwedayan, neyarên nemerdan in. Zarokên dilgeş, mêrên avis, demên serberedayî,

dîrokzan, şewekar, hunermend, rojnamevan, extiyarên li

qehwexaneyan, jinên li xwepêşandanan, şervan, helbestvan, hunermend, bişşk, parêzvan û dayikên ku dinyayeke bêşer daxwaz dikin.

Rehma pêxemberan, bêminetiya xwezayê, azarên di kevnepoyekê de diçin.

Arezûyên dinyayê, xwekuştî-nên erzan, zivistaneke dijwar, pêxirtengiyên gilover, qeyrana aboriyê, munaqeseyên li nav bazaran, deshilatdarî, zanistiya gerdûnê û pîvanên diyalektîkê, di rojevê de ne.

Bindestiya şevê, gotûbêjên li ser ziman, destên kelepçekirî, xewnên mişextkirî, tûrikê koçberiyê, nextê azadiyê, stran û govenda ku bi hev re qenciye vedibêje. Kêmetewe, nasname,

çarenûs, yekitî, kurd, ereb, turkmen, çerkez, suryan-aşurî, xiyanetkar-berxwedêr, hevsengiyên siyasî, nasnameyeke azad, fikir û ramanekê demokratîk di nexşerêya kurdan de ye.

Piştire,

Di axir zemanên dinyayê de zimanên me yê ku hîna li ber kêrê ye.

Mirov qelenê sanciyên te yê vê sedsalê ji bîr ve neke.

Ez bi xêra îskeîsk û nalenalên dayikê, di vê şeva dirêj de, vê gotarê bi zaravayê kurmançî dinivîsim.

Welatê diya min di wê zivistanê de û di bin aşutekê de ker û lal mabû.

Wexta şîr dida min, wexta ez di dergûşê de dihejandim û bi zimanê bindestiyê vedigot.

Bax û bostanê Feqîyê Teyran di bin aşuteke bêeman de mabû.

Ne mirîyên razayî rabûbûn, ne jî çûk û teyrikên li ser çiqên daristanê bi zimanê xwe gazî me dikirin. Feqîyên medreseyan, gund, dêrên filehan, hestiyên armenan, çengên xwe bi firîne dixistin. Mirov ji ber êşa xwe radiketin. Şêx, ilimdar, civaknasên wê demê jî ji xwedayê xwe re hêvî, bextewerî û aramî dixwestin.

Diya min bi dengê min dixwest birîna xwe hênîk bike. Berî

16 salan ji min re gotibû; lawê min ji min re strana Evdalê Zeynikê bibêje;

'Temo lawo, quling hatin, li ber per û esmanan re baskên xwe vekirin.

Mirin çetir e ji feqîriyê.'

Di rastiyê de zimanê dilê min, hinavên min û tevahî laşê min di qirîneke bindestiyê de û di wê çaxê de olanek dabûn. Strana ku dayika min jê hez dikir, min nekarîbû bibêjim. Min ne çiroka Evdalê Zeynikê dizanibû û ne jî bi temamî straneke wisa di hişê min de hebû. Wê demê min jî bi temamî fêm nekiribû ku birîneke dayika min ya hezar salan heye. Bi vê strana xweş û qedîm birîna dayika min li ber sekeratê mabû. Sal bi biharan, bi salnameyan, ne birîna dilê min hênîk bûbû û ne jî min daxwaza dayika xwe pêk anîbû. Ez ji wî zemanî vir ve ji her tiştî re dereng mabûm. Bi kurtasî wexta mirov strana dayika xwe nebêje, mirov di nav rastiya civaka xwe de wek mêrê avis e. Ew mêrê avis di nav sanciyên bindestiyê de xwe digevizîne û diçe. Heke mesele bibe çand, ziman, dîrok, mesele cuda dibe. Zimanê kurdî jî wê her tim bi zimanê serdestan, bi bindestiyê bê pênasekirin. Kurd ne 'mêrên avis' dixwazin ne jî zimanê qirkirin û bindestiyê dipejirînin.



Samî Hêzil

Karah Kaplan

Di van dused salên dawî de rêya gelek ewropîyan ji welatê me -bi gotina wan welatê bejî- re derbas bû. Birek rojhilatnas, zimanzan, mîsyoner, sixur, tucar û koleksiyoneran dewsa piyên xwe li ser axa me jî çêkirin. Hin ji wan di ser rêça xwe ya ber bi Hindîstanê û Çînê de, ji bo demeke kurt rawestiyan, bes destvala ji neman, kar û barên xwe jî pêk anîn. Hinekan jî ew erdnîgarî kir armanca xwe wek -last destination- û bi salan li vir man û gelek berhemên çandî tomar kirin.

Ji wan gerokan hinekan hema wek çerçiyên çî ditîbin berhev kirin û birin welatên xwe. Hinek rastî gundiyan fêlbaz hatin û bi kaxezên qelp ên bi destçêkirî hatin xapandin. Hin ji wan wek Papaz Wîgram bi kîna hezar salan a dînî tevgeriyan û piştî xwarin û vexwarina li ser sifreyên malmezînan kurd di dawîya seferên xwe de navên wan reş kirin û agahiyên nerast û pirole nivîsîn. Hinekên wek Oskar Mann bi tespîten xwe nîqaş û aloziyên zimanî yên sedsale mirat hiştin. Dewsa piyên camêrên wek A. Jaba û M. Hartmann ji li ser axa me ma, her ku rûpelên pîroz ji windabûnê û ji rizîzê rizgar kirin û li qulçên elit ên bajarên Ewropayê kirine mêvan.

Xwedê ji wan razî be. Hinekên wek A.H. Sayce çî nivîsarên mixî yên li ser kevîran hebin xwendin, deşifre kirin û bêje û qalibên zimanî tev aşkere kirin. Hinekên wek Major Soane jî ji aliyekî ve li ser zimanê kurdî xebitîn û ji aliyê din ve jî çî rehetî nedan welatperwerên kurd û xebatên wan asteng kirin.

Berhemên wan kesan nivîsîn piranî li ser çanda kurdan û zimanê kurdî ne. Helbet divê qala pirtûkên dîrokî û belgeyên siyasî jî bê kirin. Yên bi mijarên cuda, wek topografya, erdnîgarî û mijarên din ên balkêş hene. Lê romanek di nav wan de ye ku bawer im cihê wê pir taybet e, lewre minakên wê hema bêje tune ne. Nivîskarê wê romanê Charles Stuart Savile ateseyekî dewleta brîtanî yê Prûsyayê bû. Camêr di sala 1870 ê de, di temenê 54 salî de dimire. Roman di sala 1842'yan de li Londonê çap bûye û jî se cildan pêk tê. Navê romanê yê tam; "Karah Kaplan or The Koordish Chief, A Tale of Persia and Koordistan" (Pilingê Reş an jî Serokê Kurd, Çirokeke Persiya û Kurdîstanê) ye. Roman bi çiroka jiyana Ferîdûn û Îsmailê bavê wî yê şivan dest pê dike ku li devera Hemedanê dijîn û Îsmail dibe evîndarekî neçar ê keça Begler Begê Hemedanê yê bi navê Mehdî Xan. Piştî 50 rûpelên destpêkê gotin tê ser lehengê romanê yê bi navê Allah Verdee Karah Kaplan ê ku serokê eşîreke Kurd e.

Nivîskarê romanê Savile di pêşgotina xwe ya bi du rûpelên kurt de navê romanê - Karah Kaplan- rave dike lê nabêje bê ka çima ew nav bi-jartiyê an jî aşkere nake bê ka Allah Verdee Karah Kaplan navê kesekî rastî ye an jî lehengekî çêkirî ye. Di vir de pirseke bertekî 'çima ne Pilingê Reş lê Karah Kaplan û çima "h" bi dawîya "Kara"yê ve kiriye?' tê hiş mirov. Divê neyê jibîrkirin ku

tam di heyama ku Savile navê Chief-Şef- li kurdekî dikir de, kura-pên wî yên li Amerîkayê jî di nêçira şefên çermesor ên nişteciyên wî welatî de bûn. Bûyer û encamên wan nêçîrên çermesoran jî bo brîtanî û amerîkiyên nû bûbûn çirokên balkêş. Gelo Savile ev navlêkirin, ango Karah Kaplan, ji wan şefên neçarê bazdanê yên wek Crazy Horse (Hespê Dînik) Sitting Bull (Boxeyê Rûniştî), Black Fox (Rûviyê Reş) negirtibe.

Roman daneyên pir bi qîmet pêşkêş dike ku teqez dê bi kêrî lêkolînê çandî, edebî û zimanî bîn. Ji hêla din ve, bi tenê du diyardeyên ji romanê jî dikarin wesifdayîna oryantalist yek-ser raxin pêş çavan. Yek ji wan pesnê Karah Kaplan e: "Li ser rûyê dinyayê Rustemekî wek wî tune. Hespêkî jêhatî û şûrekî baş bidin wî û meydanekê berfireh bidin ber. Ew ê bi yek destî timamê serbazên Şah tîk bibe." Di rûpela dawî ya cilda sêyan de her çiqas jî ber birîneke xedar li ber mirîne ye û nikare ji cihê xwe bîlive jî, Karah Kaplan bi hewleke dawî zorê dide xwe û diqire. Gotî-nên dawî yên Karah Kaplan, ê ku êdî ne li ser hemdê xwe ye, wiha ne: "Êrişî wan kûçikan bikin, hemûyan bîkujî, kitekî nehêlin. Mûrad, Mesûre de lîxin heki hûn mîrin. Ji bir nekin em kurd in. Serkeftin! Serkeftin! Wa direvin, me tola xwe stand". Di pey re jî mirîna wî tê pênasekirin: "Her ku ew gotin ji dêv derketin, recifînen dijwar girte bedena wî, hema bêje hilpekiya ser lingên xwe û bi candayî ket erdê." Fermo wêneyê kurdekî! Bi tîra xwe mitolojîk, lehengêkî bixof, xwedî hêzeke samnak û serokekî şerût ta deqeya dawî.

Ev romana jibîrbûyî li benda şîrovêkirina xwînerên xwe ye, bes bi berdêla xwendina 871 rûpelan. Hem ji bo xwendina çavdêriyên cihêreng ku digihîjin kêmtirîn 180 sal beriya niha der barê civaka kurd ê kesayetên wê; û hem jî ev pirtûk dikare bibe metnek girîng û kêrhatî ji bo sererastkirina hesabekî kevn. Ev hesabê tîkîlhev ku aliyekî wî nasnameya me kurdan e û aliyê din jî hesabê berjewendîya serdestên ewropî ye. Hesabê nasnameya me kurdan a ku bi pênûsa oryantalistan di deftera Ewropîyan de qeydkirî ye û çî gava ku kurd bi awayekî bikevin rojewa wan, ew terefên xwe bi wan agahiyên nav dosyeyên kevn rojane dikin. Her wekî helwesta bazirganê cihû yê dema destengiyê hesabê berê vedikole ji bo derxistina deynên nû!



KARAH KAPLAN; OR, THE KOORDISH CHIEF. A TALE OF PERSIA AND KOORDISTAN

CHARLES STUART SAVILE



Kurdên li Komara Xweser a Adigeyê ya girêdayî Federasyona Rûsyayê dijîn bi zor û zehmetiyên pir mezin re rû bi rû dimînin. Ev kurdên beriya niha bi sed salî ji ber zilma dewleta tirk ji axa welatê xwe qut bûne û piştî penaberîya welatên cuda yên mîna Ermenistan, Kazakistan, Gurcistan, Kirgizistan, Ozbekistan û Azerbaycanê derbasî welatê Rûsyayê bûne niha, ji bi listikên dewleta tirk re rû bi rû dimînin.

Ji ber Komara Xweser a Adigeyê di çarçoveya pergala federasyonê de bi awayê zagonî serbixwe ye, zexteke ango mudexeleyeke Moskowayê ya yekser li ser vê herêmê çênabe. Ev herêma wek navenda çerkezên ji tê bi navkirin ji derveyî çerkezên gelek neteweyên mîna kurd, ermen, kirgiz, ozbek, rûs, tatar, azerî, tirk û hwd. ji dijîn.

Ev herêm beriya her tiştî bi çandîniya xwe ve tê naskirin. Beriya niha bi çend rojan Serokdewletê Rûsyayê Vlademîr Pûtîn di daxuyaniyeke xwe de da diyarkirin ku berhemên ji Komara Adigeyê derdikevin heya demeke dirêj têra gelên Rûsyayê dikin. Ji ber gelê kurd ji gelekî kedkar û bi taybetî ji di warê çandîni û cotkariyê de xwedî berhem e li vê herêmê xwedî roleke diyarker e.

Bêguman aktîfûna kurdan a li vê herêmê ne ji ber berhemedariya wan, ji ber birêxistinbûna wan e û bi saya vê yekitiya wan heye. Di serî de çerkez û bi taybetî ji tirk gelek kes ji vê yekîtî û ti-



Xweşkanî

Felemez Ulug

Li Adigeyê hebûna kurdan

faqê nerehet in. Dewleta tirk li vê herêmê ji ji bo kurd nebin xwedî maf û yekitiya xwe saz- nekin di nav fêlbaziyên cur bi cur de ye.

Em ji bir nekin ku di sala 2012'an de bi daxwaza dewleta tirk kurdê bi navê Mecid Gumuş radeştî Tirkiyeyê hat kirin. Ji ber Komara Adigeyê li gor zagonên xweseriyê tê birêvebirin, di gelek mijaran de Moskowa ji nikare mudaxeleji vê herêmê bike. Lewma dewleta tirk ji bo li vê herêmê ji kurdan ji hev dûr bixîne yekitiya wan xira bike û bi her awayî pêşî li wan bigire di nav xebateke pir qirêj de ye.

Li Komara Adigeyê nêzi şeş hezar kurd dijîn. Kurdan bi avakirina saziyên civakî xwe birêxistin kirine. Di hemû mijarên civakî de ev, sazi xwedî roleke pir diyarker in. Li her gundî komîteyên rûspiyan hatine avakirin. Di nav civakê de nîrxê endamên meclisa saziyê û komîteyên heyi pir e. Di gelek mijarên civakî de neteweyên cuda ji alîkariyê ji saziyên kurdan dixwazin. Yanî ger gotin di cih de be kurdên li vê herêmê dijîn beyî kes bi wan re bibe alîkar ew xwe bi xwe pirsgrîrêkên

xwe çareser dikin û xwe bi rê ve dibin.

Lê wek li her derê ji bo kurd nebin xwedî yekîtî û nebin hêz dewleta tirk li vê herêmê ji dixwaze gelê kurd perçe bike û bêtafaq bihêle. Dixwaze vê yekê ji bi avakirina hin komîteyên dijberî kurd û bi hin neteweyên li herêmê ji hebûna kurdan acizin pêk bîne. Di vê çarçoveyê de ji bo saziyên kurdan bîr girtin ji xebateke mezin ya lobiyê tê meşandin. Beriya niha bi çend mehan bi hinceta endamên meclisa saziya jînên kurd a Adigeyê der barê êrişên dewleta tirk ên li ser kurdan daxuyaniya şermezarkirinê daye, sazi hat girtin. Bi heman hincetê dixwazin saziya civakî ya Agiriyê ji bigirin.

Demeke dirêj e kurdên ku li Adigeyê dijîn di bin zehmetiyeke mezin de debara xwe dikin û bi tu awayî ji yekitiya xwe tawiz nedane. Lê wek li tevahî cihanê şewba koronayê li vê herêmê ji jiyana tengav kiriye û derdê heyi girantir kiriye.

Di van rojên teng de li Komara Adigeyê kurd ji bo bikaribin xwe ji vîrusê biparêzin gelek ked didin. Lê ji ber polîtîkaya nerast û

bêtedbiriya endamên tenduristiye li vê herêmê gelek kes nexweş ketine. Ji ber li herêmê bi awayekî zanistî sedema vê nexweşiyê kurdên destnîşankirin, kurd ji vê rewşê gelek aciz in. Li ser vê ji bo li herêmê ev rewş bê çareserkirin daxwazî hene. Di encama lêpîrsîna hatî kirin de derket holê ku mudurê tenduristiye ji di nav de gelek endamên tenduristiye bi awayekî zanebûn kurd kirine hedef. Her wiha ji ber çavê xwe li zordestîya li ser kurdan tê meşandin girtiye serokşaredarê herêma Krasnogvardeysk a Komara Adigeyê Albert Osmanov ji erkê hat girtin.

Li herêmê dibe ku di nav civakê de nerehetiyên cuda hebin û ev yek di xwezaya hemû civakan de heye. Civak li gor xwezaya xwe bi pirsgrîrêkên xwe re mijûl dibe û li gor zagonên xwe ji pirsgrîrêkên heyi re çareseriyê dibîne. Lê ger ev pirsgrîrêk bi awayekî zanebûn ji bo di nav civakê de nerehetî bê avakirin û beşeke civakê bi zanebûn tune bê hesabandin derkevin holê, wê demê mafê civakê yê serke ew e ku xwe li himberî vê biparêze.

Niha li Komara Adigeyê bi mudaxelejiyên hatine kirin ve kêma be ji av zelal dibe. Lê hîn gelek tiştên ji bo avê şelû bikin li herêmê hene. Pêwîst e kurdên li herêma Adigeyê dijîn li beramberî vê yekê hişyar bin. Di nav ava şelû de tiştên ji bo tenduristiya mirovan baş ji hene.

Berhemên ruhê xwebûnê-1 Evdirehman Paşeyê Babanê

Abdurrahman Sever

Piştî avakirina şaristaniya devletê, çewisandin, talankirin, zordestî, tunekirin, koletî, desthilatdarî û hwd. formata fermiyetê digre û wek zagon tê pê-nasekirin. Ferman li ser fermanan tê derxistin, da ku qada hikumraniya serdestan berfireh bibe û hêza xwedê-qralan mezin û serwer bibe. Encama fermanan ji şerên mezin û kirêj, komkujî, hêsiyên çavên zarokan, talankirina jin-civak-netewan e.

Ne hewce ye kitekita zilm û zordestan bînin zimên, ji ber ku berxwedêrî ji zilmê mezintir û girîngtir e. Dîrok û mirovahî bi saya serê berxwedan û serhildanan li ser pêyan e. Dîroka mirovahiyê, bi berxwedanên li

hemberê zilmê hatiye nivîsandin. Zordestî çiqas zêde bibe jî, asta têkoşinê ji ewqas bilind dibe. Her wiha çîrok, helbest, dengbêjî li ser serpêhatiyê û berxwedêriyê hatiye gotin.

Bêguman di dîka cihanê de her netew, civak û bawerî li dijî hişmendîya desthilatdariyê xwe parastîye û têkoşîye; lê belê, cihê Kurdan hinek cuda ye. Kurd, tenê xweparastîne ve nemaye; pir caran rûmeta cihanê ji rizgar kiriye. Bi sedsalan e bi bêdewletbûyîna xwe ve pêşengîya berxwedêriyê kiriye û hîna jî dike. Li ser axa xwe ya pîroz, ji bo hebûna xwe, herî kêma bi çar dewletan re şer dike. Kurd ku di dîroka cihanê de netewa herî kevnar û qedîm, di her serdemê de bi berxwedêriya xwe ve him ji bo xwe him ji bo mirovahiyê berhemên rihê xwe-

bûyîne diafirîne. Dizane ku xwebûyîn, bingeh û çavkaniya azadiyê ye. Her wiha ji wan berhemên rihê xwebûyîne yek ji bêguman Evdirehman Paşeyê Babanê (babanzade/babanli Abdurrahman Paşa) ye.

Evdirehman Paşe, ji eşîra Babanê kurê Mîr Mahmud ê ku pêşengê eşîrê ye. Hê di zaroktiya xwe de zarokêkî jîr, zîrek, wêrek û taybet e. Bi jîrbûyîna xwe ve di herêma Silêmaniyê û der doran de tê naskirin. Li gel bavê xwe serpêhatiyê fehm dike û hîn dibe. Bi temenê xwe yê ciwanîyê ve bi mezinên civakê re tevdiqere û dikeve nav hemû çareseriyên pirsgrîrêkan û bi aqilê xwe yê jîr pir caran dibe hêza çareseriyê. Him di aliyê çekdarî de him jî di aliyê zanistê de xwe pêş dixê. Bi sekna xwe ya esalê ve jî li her derê xwe dide qebulkirin û di şeşsê xwe de rêzdariyeke mezin diafirîne. Di sîh saliya xwe de dibe pêşengê eşîrê.

Di destpêka salên 1880'an de Osmanî gelekî ketine pêvajoya paşveçûyîne û her dihere erdê ku bi zorê girtiye, wînda dike. Şerê osmanî û rusan jî li ber derî ye. Osmanî, çiqas li rojava erd wînda dikin ewqas dixwazin rojhilat bi xwe ve girebidin û otonomiya kurdan bêşert û qeide ji destê wan bigrin û kurdan bi temamî bixin xizmeta xwe. Di wê pêvajoyê de jîr û wêrekiya Evdirehman Paşe, ji bo desthilatdarên herêmê dibe xof û xetere.

Mîr Evdirehman ne tenê pêşkêşê eşîrê bû, di salên derbasbûyî de bibû mîrê herêma Silêmaniyê û li hemû herêmê bist salan pêşengî kiribû. Xwedî serpêhatiya sîyaseta û leşkeriyê bû. Lê belê, tiştê ku Evdirehman Paşeyê Babanê ji mîrê beriya xwe cudatir dikir; rihê



serxwebûnê bû, ango rengê azadiya netewa Kurd bû. Dixwest ku hikumetê serbixwe ya kurdan damezirîne û gelê kurd ji bin bandora desthilatdaran rizgar bike.

Di sala 1806'an de Halit Paşeyê birayê Mîr Evdirehman, li Silêmaniyê bi destê Osmanîyan wek walî tê tayinkirin. Bi vî awayî nakokiya malbata Babanê bi kar tînin û dixwazin pêşî li Mîr Evdirehman bigrin. Lê Mîr Evdirehman mirovekî qelender û bi esl e. Ger pêwîst be, ji bo serxwebûna gelê xwe, tevahiya malbatê ji dike qurban. Piştî vê bûyerê, Mîr Evdirehman dikeve nav hewldanê û rêxistina şerê serxwebûnê dide destpêkirin. Di demeke kurt de hêzeke mezin ava dike û li ser hêzên Bexdayê dimeşe. Li herêma Bazîyan şerêkî dijwar diqewime. Tê gotin ku cara yekem e xortên Kurd, ne ji bo otonomi an jî aboriyê; tenê ji bo rihê xwe yê kurdewarîyê şer dikin. Lê belê kambaxa ixanetê û hevkarîyê ne cara yekem e, dê ya dawiyê jî nabe. Ji ber hevkarîya Halit Paşe yê bi

hêzên Bexdayê re, hêzên Mîr Evdirehman tîk diçin. Rojên zor û zahmet carek din destpê dike.

Mişextî, koçberî, xizanî wek bîra qedere pêşîya pêşawa ye. Meh, demsal û sal derbas dibin. Walîtiya Silêmaniyê ji Halit Paşeyê birayê Mîr Evdirehman re jî namîne, lê evîna welêt û azadiyê tu carî ji bîra Evdirehman Paşe naçe. Hêza xwe kom dike cara diduyan; ev jî tîrê nake cara sisêyan bi hêzeke mezin serhildanekî çedike û êriş dibe ser hêzên Osmanîyan. Mixabin, hevkarîya der û doran carek din xwe nişan dide û Evdirehman Paşe dîsa tîk diçe. Gelê Kurd bindestîya xwe dîsa didomine û hevkar, serxwebûna gelê netewa xwe dikin qurbana berjewendiyên xwe yê şexsî.

Dibe ku Mîr Evdirehman, di armanca xwe ya serxwebûnê de encam negirtibe, lê gotinên wî yê dawiyê balkêş in û di esasê xwe de tîkneçûyîne nişan didin; "şerê me tova serxwebûyîne bû, agirê evîna azadiyê êdî beh-tir gur dibe"



Jiyan dê çawa asayî bibe?

Li tevahiya cihanê yek bi yek tedbîr hatin sistkirin û niha jî plansaziyên asayîbûna jiyanê tî amadekirin. Ji ber rewşa nezela, pêvajoya asayîbûna jiyanê dê bandoreke çawa li civakê bike hêj ne diyar e

Navenda Nûçeyan

Virusa koronayê (Covid-19) li bajarê Wuhan Çînê derket holê û di demeke kurt de li tevahiya cihanê belav bû. Li gorî daneyên dawîn li cihanê jî 5 milyon zêdetir kes bi vîrusê ketine û her wiha bi sedhezaran kes jî mirine. Li gorî daneyên dawîn herî zêde li Amerîkayê mirin pêkhatin. Her wiha li Îngîlistan, Îtalya, Spanya, Brezîlyayê, Belçîka, Almanya, Îran, Kanada, Hollanda, Meksîka, Çîn, Tirkiyê, Swêd, Hindistan û Rûsyayê jî hejmar miriyan gelek zêde ye.

Di destpêka pêvajoyê de tenê

Karker di xetereyê de ne!

Koordinasyona Krîza Covid-19ê ya Herêmê her hefte der barê bandora vîrusê de raporek aşkera dike. Rapora hefteya borî jî li ser rewşa karkeran bû. Di raporê de wiha hat gotin: "Vîrusê betir li ser kesên xizan, jin, ciwan, zarok, penaber, betal, karkerên çandiniyê û karkerên li fabriqeyan dixebitin bi bandor bû. Dema karker û kedkar xebitî jî ji bo wan tedbîr nehatin girtin. Divê ev rewş biguhere û şert û mercên hemû karkeran bîn sererastkirin."

Koordinasyonê di rapora xwe daxwazên xwe wiha rêz kirin:

- ✓Karkerên her tim temsa wan bi gel re heye yê wekî karkerên kargo û PTTê divê hefteyê carekê test bikin û şert û mercên kar bîn sererastkirin.
- ✓Divê biryarên tedbîrên li dijî şewbê tenê bi 2-3 patronan neyê girtin. Divê nûnerên sendîka, ode, komele û hemû rêxistinên demokratîk jî tev li pêvajoya girtina biryaran bibin.
- ✓Divê serwisên karkeran bîn zêdekirin û di bin parastin û ewlehiyê de karkeran bibin mal û cihên karê wan.
- ✓Divê dîrxistin û derxistina karkeran a ji kar bîn qedexekirin.
- ✓Divê der barê şiketên karker ji kar derxistine de lêpirsin bîn destpêkirin.
- ✓Divê pirsgirêkên karker û kedkaran neyên veşartin. Divê serî li sendîka, ode û komele-yan bidin û bi raya giştî re parve bikin.
- ✓Divê hemû malzemeyên parastinê bê pere li hemû esnaf û xebatkarên cemaweriyê bîn belavkirin.
- ✓Divê nûnerên ode, sendîka û rêxistinên tenduristiyê jî tev li maseyên kirazê yê herêmê bikin.



navê vîrusê hat bilêvkirin, bi belavbûna vîrusê re jî rewş guherî û êdî tirs, fikar ketin dewrê. Dûre pêvajoya li tevahiya cihanê derbasî qonaxa tedbîrgirtinê bû. Piştî demeke dirêj niha li tevahiya cihanê yek bi yek tedbîr tî sistkirin. Hemû plansazî jî bo asayîbûna jiyanê tî amadekirin. Di vê pêvajoyê de pîrsa herî zêde tê kirin: gelo vîrus hatiye kontrol kirin? Jiyan dê çawa asayî bibe? Sistkirina tedbîran dê bandoreke çawa li civakê bike? Ev pîrs niha li benda bersivan in. Lê diyar e dê piştî qonaxa asayîbûnê bîn bersivandin.

Li gorî daxuyaniya Rêxistina Tenduristiyê ya Cihanê (WHO) roj bi roj hejmara pêkêtiyê mirinê jî ber vîrusê kêmtir dibe û tedbîrên hatine girtin pêşî li ber vîrusê girtiye. Lê bi sistkirina tedbîran dibe ku pêla duyemîn jî dest pê bike û bîlanço ya ve girantir bibe.

Tevî rayedarên dewletan tedbîrên girtine sist dikin jî zanyar, bijîşk, sazî û rêxistinên tenduristiyê bi fikar nêzîkê dibin. Yek ji wan Serokê Yekitiya Tabîbên Cihanê Frank Ulrich Montgomery e. Montgomery, diyar kir ku Ewropa jî bo sektora turizmê sînoren xwe vedike û ev tişt xetereyê û got: "Bi asayîkirina jiyanê re dê rê li ber pêla duyemîn vebibe û dê tabloyeke girantir derkeve holê."

Seroka Navenda Kontrol û Pêşgirtina Nexweşiyên Ewropayê (ECDC) Andrea Ammon, diyar kir ku divê Ewropa li gorî pêla duyemîn a vîrusê xwe amade bike û wiha axivî: "Li gorî min pîrsa herî girîng jî gelo dê pêla duyemîn kengê dest pê bike û dê bandora ve çawa be. Em naxwazin tabloyeke qiyametê xêz bikin lê dem ne dema rehetiyêye."

Ne meclis AVN hatin vekirin

Li Tirkiyeyê pêvajoya asayîbûnê di 11'ê gulane de bi vekirina kuafor, navendên danûstandinê, dest pê kir. Piştî cejna Remezanê jî dê plansaziya asayîbûnê betir bikeve meri-

yetê. Tevî ev qas pirsgirêkên heyî û rewşa xeternak li Tirkiyeyê navendên danûstandinê (AVM) pêşiya meclisa Tirkiyeyê hatin vekirin. Îkîfîdar jî tabloya xeternak hewl dide ku asayî nîşan bide û tenê bi çend pêşniyaran bangewaziyên xweparastinê dike. Li gorî endamê Lijneya Zanyarî ya Koronavîrusê ya Wezaretê Tenduristiyê ya Tirkiyeyê Prof. Dr. Levent Yamanel di vê pêvajoyê de jî bo xweparastinê 4 xalên girîng hene û got: "Xwe ji komên mezin û qelebalix dûr bixin, bê maske dernekevin derve, mesafeya civakî biparêzin û li paqijîya xwe baldar bin."

Rewş zelal nîne

Endamê Lijneya Çavdêriyê ya Covid-19ê ya Konseya Navenda Yekitiya Bijîşkên Tirk (TTB) û pisporê tenduristiyê gel bijîşk Kayihan Pala, pirsgirêkên dê bi pêvajoya asayîbûnê re biqewimin wiha şîrove kir: "Di 11'ê gulane de pêvajoya asayîbûnê qonax bi qonax hat destpêkirin û ev dîrokeke pir zû bû. Biryara vekirina navendên danûstandinê jî divê bê rexnekirin. Ji ber ku di despêkê de vekirina kargerîyên biçûk ên girtî maqûl bû. Em niha jî hejmara nexweşan û kesên bi vîrusê mirinê bi zelalî nizanin. Der barê belavbûna vîrusê ya li herêm, parêzgeh û navçeyan de agahiyên zelal nînin. Dê çawa pêvajoya asayîbûnê bîn destpêkirin."

Li Ewropayê bêkarî

Her wiha bi sistkirina tedbîran û destpêkirina jiyanê asayî, krîza aboriyê jî xwe da der. Li tevahiya cihanê niha krîza aboriyê heye û bûye sedema bêkariyê. Komîseriya Berpirsê Mafên Civakî û Îstîhdamê ya Yekitiya Ewropayê (YN), da zanin ku ji ber bandora vîrusê niha 27 welatên Ewropayê bi 10 milyon mirov niv demî dixebitin û dibe ku di mehên pêş de ev kes bêkar jî bînin. Endamê Berpirsiyariya Xizmet û Bazara Navxweyî ya Komîsyona Ewropayê Thierry Bre-



Maskeyên li kolanan xetere ne!

Li tevahiya cihanê jî bo xweparastinê maske û lepik tîn pêşniyarkirin. Her wiha li gelek welatan jî bikaranîna maskeyan hat ferz kirin. Êdî lepik û bi taybetî jî maske bûn parçeyek jiyanê mirovan. Maske û lepik jî bo xweparastinê bûn alavên girîng, lê bi xwe re jî xetereyên mezin jî anîn. Niha li kolan, otobûs, minibusan maske û lepikên hatine bikaranîn hene. Bijîşkan destnîşan kir ku ev tişt jî vîrusê jî xetertir e û tenduristiyê gel tehdît dike, ne tenê xwe û divê derdor jî jî vîrusê bê parastin. Bi taybetî bijîşk bikaranîna lepikan pêşniyar nakin lê bikaranîna maskeyan ferz dikin. Maskeyên tîn bikaranîn divê bixînav poşet û piştê bavejin çopê. Maskeyên davêjin erdê bi taybetî jî bo zarokên li kolanan dilizîn dibe xetereyek mezin.

ton da zanin ku ji ber krîza aborî dibe ku li Ewropayê 30 milyon kes jî kar bîn derxistin û got: "Jixwe di sibata îsal de 14.1 milyon kes bêkar bûn û piştî asayîbûna jiyanê dibe ku hejmar 3 qat zêde bibe."

16 milyon bêkar hene

Her wiha li gorî daneyên Yekitiya Odeyên Avahîsaz û Endezyarên Tirk (TMMOB) jî ji ber vîrusa koronayê hejmara bêkaran li Tirkiyeyê bû 16 milyon. Li Başûrê Kurdistanê jî heman rewş heye jî ber vîrusê du meh in Hikûmeta Herêma Kurdistanê mûçeyên milyon û 200 hezar kesî nedaye û jî bo mûçeyan jî tu plansazî nehatiye amadekirin. Îran tevî ambarogoya heyî bi vîrusê re ket nav krîzeke kûr, jî ber ku sînoren hatin girtin bi tevahî bazirganî rawestiya.

Der barê WHO'yê de lêpirsin

Ligel ev qas geşedanan hefteya borî Amerîka û Çîn jî di nav de 194 welatên endamên Neteweyên Yekbûyî biryara lêpirsina Rêxistina Tenduristiyê ya Cihanê (WHO) da. Welatên endamên Neteweyên Yekbûyî biryar da ku di demeke kin de bi awayekî serbixwe û bê alî der barê polîtîkayên WHO'yê yê pêvajoya vîrusê de lêpirsin bê destpêkirin. WHO bi taybetî jî ber derengmayîna tedbîran tî rexnekirin. Ev tişt nîşan dide ku gunehkarên vê pêvajoyê, hemû kêmasiyên xwe di bin sîwana rêxistinê de veşêrin û her kes hevdu sîncdar dike.

Dilan Aydın



Cejna meha paşîv û berbangê...

Meheke ku me dike şahidê şevê derbas bû. Şahidî û raza şevê, rewşeke cuda û xweş e ji bo yê ve 'meha rojîyê' bi şiyariya şevê ango dema paşîvê dijin. Şev şahid e ji me re. Bi bédengî û aramiya xwe şahidê me ye. Me dibîne, em jî wê dibînin, me jî xewê şiyar dike, em jî wê şiyar diborîn. Ji tirs û xewnên tevlihev, jî mirinê... Şev me şiyar dike jî bo hêviyê nû, jî bo dîtina berbangê. Wê dema tîk û tenê me şiyar dihêle! Şeva şahidê dixwaze em şiyar, bi hêvi û li ser piyan berbangê bibînin. Dixwaze em bibin şahidên ronahiya piştî berbangê hêdî hêdî li asman belav dibe.

Ey şeva ku ve mehê, jî tenêtiyê xilas dike, meha rojîyê ya bi şiyariyê xemilîyê! Me di hinek kêliyên şevê de sal dozdeh meh şiyar bihêle jî ve xewa ku 'nivê mirinê ye!' Şiyariya baş û pêwîst bike para me. Ey meha şiyariya jî xewê û paşîvê! Çawa ku şev vediguhere berbangê, berbang vediguhere rojê; me jî ji halê me yê hevi, veguherîne tişteke din. Me jî nebesiyên me, jî sîc û gunehên me yê em bi wan nizanin û wan nabînin veguherîne şiyarî û zanînê.

Îsal bi bédengîya jî ber nexweşîya belavbûyî, em jî biharê dîr man. Dûre jî meha rojîyê dest pê kir. Dixwazim bibêjim ku ev meh, li gorî armanca xwe bû. Derfeta kûrbûna fikrî û ramanî zêde çêbû. Bédengîya kolanên bajêr, dibûn sedem ku tu bikarî bi wateya ve mehê tîbigihîjî. Leza me ya ku nahêle em baş bêhnê bigirin, bifikrin îsal kêmtir bû. Leza ku em dibêjin qey jî bo 'jiyanê' ye, jî bo kar û barê me yê pêwîst e di rastiyê de qet jî ne wisa ye. Ev lez, ev deng, dibîn sedem ku em baş bêhnê negirin, nefikrin, nebînin û nejin. Ji ber wê jî hem bihar, hem meha rojîyê hem jî em jî salên berê cudatir in niha.


Dibe ku em gelek caran jî ve rewşa bi serê alemê de hatiye aciz bûbin, me bertek nîşanî ve 'nediyariyê' dabe lê jî gelek aliyan ve jî ber ku jî dem, meh û salên borî cudatir e divê em qedrê wê bizanibin. Gelo ev rewş bi qasî dagirkirina taxên bajarên ên pênc sal berê welatê me veguherandin dojhê zor û giran e? Bîra me ya ku di wan pênc salan de bi kîrx û dimenên hovane tije bûye, jî ve nexweşîya nedîtî sed car nexweştir nîn e!

Em li xwe vegehin, bibînin ku musibetên wiha, di ber ên me behsa wan kirî de biçûk dimînin. Lewre kiryarê wan 'nediyar' e, derfet û rîya xweparastinê di dest te de ye lê yê din... Gotin, hevok, jî bo vegotina wan nebes in lewre 'kiryar' diyar in û hê jî li ser kar in! Ji ber wê jî neçarbûna jiyanê bi bûyerên sîncdar û mehsûm re pir cuda ye. Sîncdar, gunehkar hingî li ser kar bin, tu dibî nêçîra wan û nikarî xwe baş biparêzî. Lê bûyerên wekî ve nexweşiyê ne wisa ne, sîncdar bi xwe ew nîn in, sîncên hinek kesan in. Loma rîya te vekirîye, tu dikarî xwe jî sîcê sîncaran biparêzî.

Bi hatina cejna meha rojîyê re îsal dimenên ku çavên me qet hîn nebûne hene. Her çiqas her du cejnên li dû hev, ev çend sal in li welatê me rastî bûyerên gelek nexweş tî jî; kevneşopîya pîrozkirina wan her didome lê îsal rewş gelek cuda ye. Ji ber nexweşîya ku ev çend meh in di rojê cihanê de ye, bû sedema mirina sedhezaran; em îsal cejnê jî kevneşopîya wê cuda pîroz bikin. Ya rast û pêwîst ew e, em li ku dibin bila bibin, wan rojan li gorî wate û manewiyata wan bijin. Sînore zeman û mekan ên ku dehan salan in em dijin, em hîn gelek rîyên çareseriyê kirine. Tenê tevgera rast jî bo me pêwîst e.

Bi vê wesîleyê, bi hêviya roj û mehên xweştir; cejna meha rojîyê li me hemûyan pîroz be!

Şîngirtin wek berxwedanê



Derya Aydın

“Eger em têk biçin, miriyên me jî dê ji vê yekê para xwe bigirin”

W. Benjamin.

Mirin, birin û şîn

Mirin, di hişûbîra mîmetîk a civakan de teqabûlî têgehîştinên curbicur dîke. Di dirêjahiya dîrokê de, ji felsefeyê heta antropolojîyê, ji psikolojîyê heta anatomîyê; ji zanistên civakî heta zanistên pozîtîf, têgeha mirinê bûye mijara gengeşeyê ya gelek dîsîplînan. Her çend di gelek zanistan de hatibe gengeşekirin jî, mirov dikare bibêje ku mirin diyardeyeke metafîzîk e. Di van demên dawî de, xerakirina goristanan û êrişên li ser miriyan, careke din hovîtiya nekropolîtîk a desthilatdaran radixe ber çavan. Helbet ev pêşk û polîtîka, tenê nosyoneke “hovîtiyê” nîn e. Di vê polîtîkayê de tiştê girîng ew e ku mirov mekanîzmayên desthilatîyê yên li ser meşandina vî polîtîkayê fehm bike. Di vê nivîsê de ez ê hewl bidim da projeksiyoneke nekro-polîtîk û panorameyêke giştî ji rabirdûyê heta niha raxim ber çavan.

Her çend mirin wek jiyane mef-hûmeke siruştî be jî, bi mirinê re jiyana qut dibe anku tê merheleyêke dîtir. Lewre têkiliya mirovan a bi mirinê re ne wek fikrî lê wek diyardeyêke derdikeve meydanê. Ji ber karakterê wê yê mutleq, mirin wek hijmetekê tê têgehîştin. Lewre jî di serencama bedenî anku biyolojîk de wek momentekê ye ku ji rehên xwe werdiçerxe. Ji ber ku mirî, her wekî din aîdî dinyayê ne lewre di rîtuelên civakî de ew her hene û her dijîn. Di nav hemû civak, bawerî û îdeolojîyan de hurmeteke mîmetîk li miriyan tê nîşandan û xizmên wan, nas û dostên wan, piştî mirinê tîz ziyaret-kirin, seferberîyêke giştî bo hevxiyê û palpiştîyê derdikeve meydanê. Bi seremoniyên veşartinê yên miriyan, hafîzeyê civakî careke din tê avakirin û şîn tê girtin, xwarin tê xwarin. Di seremoniyên şîngirtinê de hin kes li xwe dixin, hin kes porê xwe dibirrin, dua dikin an reş girêdîdî. Ji ber ku roleke terapîk dilîze, di heft û çilê wan de mirî tîz yadkirin. Ji bo ku dewsa ling û bedena miriyan her aîdî vê dinyayê bibê, ji wan re gorek tê çêkirin, wek nîşana aîdbûna vê dinyayê jî kêlikek tê danîn. Lewre di navbera goristan û şîngirtinê de têkiliyêke xurt heye. Goristan ne tenê nîşana rêzgirtina miriyan e, her wekî din ji bo nas û dostên miriyan jî pêvajoya şîngirtinê temsîl dîke. Loma şopên herî watedar li goristanan tîz avakirin. Loma wan li kevîran xist dewsa lingên xwe, bi xwe bar kirin û çûn.

Şînxaneyêke ne daîmî: Kurdistan

Li Kurdistanê wek gelek tiştan, ev demêke dirêj e, berevajî pêvajoya wê ya “siruştî” şîna miriyan ku di şerê li gel dewletê de jiyana xwe ji dest dane jî li gorî karakterê wê yê etno-kultûrî nayê girtin. Nema we jî despêka avakirina Komara Tirkîyeyê heta niha, li dor çarçoveyêke nekropolîtîk, bêgorkirin/bêmezeli-



rin wek siyaseteke bîngêhîn li dijî kurdan tê meşandin. Lê bi taybetî ji serê salên 90'an yê bi şer, pevçûn, koçberkirin û îşkenceyê heta niha (ji bilî salên 2013-2015'an) jiyana xwe ji dest dane, pêvajoyêke taybet tê meşandin. Em îro nizanin ku di wan salan de çi hatin qewimîn, kî çawa û bi çi awayî hat kuştin/wendakirin. Lewre em nizanin gora wan, cihê wan li ku ye. Fragmana xerabiyê ya bedena miriyan, di hişûbîra civaka kurd de zindî ye; gelek caran bedana rût a miriyan hat teşhîrkirin, ew bi ser hev hatin rêzkerin, wêneyên wan hatin girtin û teşhîrkirin, organên wan hatin jêkirin û li derve hatin hiştin da ku bedenên wan bibin xurê ajalan. Di şer de, gelek kes bi darê zorê hatin wendakirin, bedena wan li ser rîyan hatin hiştin û di çalavan de hatin veşartin. Nema we piştî salên 2000'an, bi xebatên hatî kirin, ev derketin meydanê.

Cudakariya şîne ya girseyî: Hiyerarşiya şîne

Heta niha, ne di salên 90'an de ne jî îro, tu carî qetlîamên li Kurdistanê pêk anîn û îşkenceyên li bedenên hatin kirin, li nav civaka Tirkîyeyê nehatin axaftin. Ev bêdengî her wekî din înkarkirina hebûna kurdan bû. Şîngirtina miriyan wek tawanekê hat qebûlkirin û lewre hat qedexekirin. Mirina hêzên dewletê li dor çarçoveyêke mîtolojîya şehîdbûnê hat pîroz-kirin, lê wek zindiyên kurdan, miriyên wan jî bi heman rengî hatin înkarkirin û şîna wan hat qedexekirin. Ev hiyerarşiya şîne wek normeke sereke li ser civakê hat ferzkirin. Kesên ku hatin kuştin ne wek “kuştî” hatin binavkirin, ew wek “berterefkirî” û bedena wan jî wek “leş” hat pênasekirin. Dîsa bi tundî seremoniyên şîne yên malbatan hatin qedexekirin, cenaze hatin desteserkirin. Li Kurdistanê bi hezaran malbat dev ji têkoşîna aqûbeta xizmên xwe bernedan. Ev reftar her çend wek hovîtiyê bîzî fehmkirin jî, di rastiyê de ew bi awayekî sistematîk wek parçeyekî muemeleya li dijî

kurdan derkete meydanê. Bi hezaran malbat, li pey hestiyên nasên xwe ketin da ji wan re gorekê çêbikin. Lewre jî qedexekirina şîngirtinê, “mirineke dubare” bû ji bo malbatan. Kaşkirina bedena Hecî Loqman Bîrlîk, sekinandina bedena Dayîka Taybet bi rojan li kolan, teşhîrkirina bedena Kevser Elturk, xerakirina goristanan, astengkirina veşartina termê Xatûn Tugluk, xerakirina goristanan li Bedlîsê û neqil-kirina termê 267 kesan bo Stenbolê, şandina termî bi rîya kargoyê û gelek reftarên bi vî rengî vê pîrsê tîne bîra mirov: dewlet jî miriyên kurdan çi dixwaze?

Hêz û sirê miriyan û sinorê desthilatîya dewletê

Êrişên li ser goristan û miriyên kurdan, nîşana hêz û bandora miriyan a li ser civakê ye. Lewre mirov dikare bibêje ku ji ber vî karakterê wê nema ew rastî êrişên sistematîk tî. Bi taybetî di merasîma veşartina Vedat Aydın de, ku bi hezaran kes beşdarî kiribûn, ev hêz û bandor bi awayekî zelal aşkera bûbû. Dîsa serborî û berxwedana Dayikên Şemiyê ku tu bend û bariyerên dewletê nas nakin jî vê yekê dide der. Nema we wendakirina bi darê zorê, “mirina derasayî” vê hêz û bandorê hê zêdetir dîke. Ev hêz tenê ne di nezera civakî de, her wekî din di warê siyasî de jî encamên girîng bi xwe re aniye. Hemû nimûneyên bi vî rengî vê rastiyê careke din aşkera dîke: bi mirinê re tenê jiyaneke nivco namîne, her wekî din berxwedan û têkoşîna mirî jî nivco dimîne û ew yek jî motîvasiyona berdewamkirina wê têkoşînê li ser yê mayî ferz dîke. Lewre yê mayî, xwe dixin şîna miriyan û berxwedana wan a nivcomayî li ser xwe ferz dikin.

Li dijî nekropolîtîka û jenosîda hişûbîrê, şîn berxwedan e!

Hemû pratîkên li dijî miriyên kurdan ên dewletê, bi awayekî tesadûfî pêk nehatine. Lewre ev pratîk,

li Kurdistanê car caran ne sext bin jî, di esasê de teqabulî polîtîkayêke sistematîk a dewletê dîke. Bêgorkirina/bêmezeliyê kurdan, meseleyêke ne nû ye. Dewsa gora Şêx Seîd û Seyîd Rîza îro jî nayê zanîn û ew yek jî nîşan dide ku ew polîtîka bi awayekî sistematîk nêzî sed salan e tê meşandin. Bi nekropolîtîkayê armanc ew e ku desthilatîyê bê qayîmkirin, lê şîngirtin, wê desthilatîya vedîçirîne û erkeke wê ya berxwedanekê heye. Ev nekropolîtîka, wek berdewama biopolîtîkayê ye ku ne tenê li Kurdistanê, li Filistin û Arjantîn jî di nav de, li gelek welatên cihanê tê meşandin. Ev wek kodeke bîngêhîn a dewletan e ku dewleta Tirkîyeyê jî vê polîtîkayê li dor çarçoveyê avakirina nasnameya tirkbûnê wek xaleke bîngêhîn dibîne.

Wek diyardeyêke, pêwendîya hişûbîra civakî bi goristanan re

Pêwendîya goristan û tarîxê, nema we di du sed salên dawî de ji aliyê ilmê antropolojîyê ve gelek hatiyê pêkolekirin. Hema hema di nav temamî civakan de geh bi awayekî nivîskî, geh jî bi awayekî mîmetîk, mirin di çêbûna hişûbîra civakî de nosyoneke sereke ye. Li dor çarçoveyê wan xebatan de mirov dikare bibêje ku “tarîx li mezalan dest pê dîke”. Lewre goristan, di çêbûn, pêşveçûn û belavbûna tarîxê de roleke sereke dilîze. Di kolanên arkeolojîk de, di Lahîtan de û li gelek der û deverên cihanê, ev pêwendî di ronîkirina gelek babetan de derketiyê meydanê. Mezel di vî çarçoveyê de wek neynikeke tarîxî ye. Êrişên li dijî goristanan jî di vî çarçoveyê de gelek zelal xuya dibin.

Wek jenosîda hişûbîra civakî, êrişên li dijî goristanan

Di navbera salên 2013-2015'an de ew goristanên hatibûn avakirin ên kesên di şer û pevçûnan de jiyana xwe ji dest dabûn, mirov dikare wek cihên hafîzeyê pênase bike. Ji bo hişûbîra civaka kurd, ev cih xwedî

taybetmendiyêke girîng e û derbarê serboriya berxwedaneke bi salan de, malûmatên giranbûha di nav xwe de dihevine. Di vî çarçoveyê de goristana li Dêrsimê hatibû avakirin, yek û yek wek cihê yadkirinê hatibû avakirin. Nema we kesên di sala 1938'an de hatibûn kuştin, di wê goristanê de hatibûn veşartin û êrişên li ser wan goristanan, geh wek neynikeke tarîxî roleke sereke dilîze, geh jî êrişên li ser wan destnîşan dikin ku, dewlet bi tu awayî naxwaze ew hişûbîra civakî ya xwe dispêre rabirdûyêkê bê avakirin. Di wê goristanê de hestiyên berxwedêrên eşîra Heyderan ên ji geliyê Laçê hatibûn komkirin hebûn. Hestiyên kurdên berxwedêr ên di sala 1938'an de hatibûn qetilkirin û yê di salên 1990'an de jiyana xwe ji dest dabûn di wan goristanan de li gel hev bûn. Lewma ew goristan, ne tenê berdewamiya şîdetê li dijî kurdan destnîşan dikir, her wekî din, hişûbîra berxwedaneke domdar nîşan dida. Êrişên dewletê yê li dijî wê goristanê, di vî çarçoveyê de baştir tîz fehmkirin.

Xerakirina goristanan, neqil-kirina hestiyên bo cihên bêdê û bêbav, li gel taybetmendîya xwe ya “hovîtiyê” teqabulî êrişêke sistematîk û domdar a li dijî çêbûna hişûbîra civaka kurd dîke. Piştî bidawîkirina proseya aşîyê, dewletê cara yekem êrişî goristanan kir û lewma ew yek ne tesadûfî bû. Ji ber ku li gorî kodên damezirîner ên dewletê, hafîzeyê civakî ya kurd divê neyê avakirin û ji bo wê çîqas hovîti be jî, divê ew bihata xerakirin. Çimkî goristan navendên berxwedanê ne û xerakirina wan jî nîşaneyê avakirina desthilatîya dewletê ye. Çimkî termê ku li axê tê veşartin, hikmê xwe jî li ser axê ferz dîke. Anku veşartina termê li axê, kolana hafîzeyê ya li ser axê ye. Lewma êrişên li ser goristanan jenosîdeke li dijî hişûbîra civaka kurd e.

✓ Ji bo alîkariya wî ya editoryal, spas ji bo Zekî Gurur

Badê vîrusî do perwerdeyê ziwane kurdî senî bibo?

Vîrus perwerdeyê ziwane kurdî zî tede heme aktivîteyan da vindetene. Mamostayê ziwane kirmanckî Sayinî va: "Seba ke şarê ma nêkewo tengayîye ma dersê online dayî destpêkerdene."


Mehmet Seyîtafoglu

Vîrusê Korona (Covid-19) ke bajarê Çînî yê Wuhanî de vejîya raşte û hema hema vilayê pêroyê dinya bî, heme aktivîteyî da vindetene. Her çiqas ke hetê Wezîrîya Weşî ragamê normalbîyayîşî bêro eştene zî xeylê zanayî ekse ci fikirîyênî û vanî ke ganî nê gamî tayna bêrî taloqkerdene ke gama diyîne yê janî nêvirazîyo.

Vejiyayîşê vîrusî ra dima hewl dîyeno ke heme xebat, aktivîte û çalakîyî keyeyan ra bêrî domnaye. Înan ra yew zî perwerde yo. Badê vîrusî Komeleya Cigêrayîşî ya Kurdî semedê wendekaran perwerdeyê onlinî yê ziwane kurdî daye destpêkerdene ke kesê ke wazenî ziwane bîmusî rê vîrus asteng nêbo. Na çarçewe de mamostayê ziwane kirmanckî Hecî Sayinî qala xebatan, programê zimanê kurdî, eleqeya seba kirmanckî û gamê normalbîyayîşî de do xebatê înan senî dest pêbikerî, kerd.

'Eleqaya şarî xeylê bî'

Mamostayê kirmanckî Hecî Sayinî destpêkê qiseykerdîşê xo de da zanayene ke seba kirmanckî û kirmanckî eleqaya şarî xeylê bî ê dest bi dersanê onlinî kerdî û wina va: "Ma sey Komeleya Cigêrayîşan ê Kurdî badê ke vîrus vîla bi û karantîna dest pê kerd seba ke wendekarê ma û şarê ma hetê perwerdeyê ziwane ra nêkewê tengayîye ma dersê online dayî destpêkerdene. Hem seba kirmanckî û hem zî seba kirmanckî eleqaya şarî xeylê bî. Mîyanê çend saetan de 1045 kesane seba kursan muracat kerd. Nînan



ra 145 kesî seba kirmanckî bîy."

'Nika dersê ma dewam kenê'

Sayinî dewamê qalîkerdîşê xo de dîyar kerde ke Ewropa û heme hetê welatê ra mîlet semedê ziwane kurdî muracat kerdîbî û bale ant programê dersan ser o û domna: "Hema hema her ca ra muracatî estbî. Ewropa û heme hetê welatê ra mîlet muracat kerdîbî. Ma zî goreyê duştê nê kursîyeran di duştî dîyar kerdî. Duştê yewinî de ê ke qet kirmanckî nêzanê ê ders vînenê. Duştê diyinî de zî ê ke kirmanckî zanê la wendîş û nuştîşê înan kêm o ê ders vînenê. Ma hewte de hîrê rojan dersan danê. Roja sêşeme û yene dersê duştê yewinî, roja pancşeme zî dersê duştê diyinî esto. Nika dersê ma dewam kenê û nêzdî 60 kesî beşdarê dersan benê. Ma dersan bernameyê Zoomî ser o danê."

'Her ca ra kursîyerê ma estê'

Sayinî cewabê persê 'Gamê normalbîyayîşî de do xebatê înan senî dest pêbikerî?' da û wina dewam kerde: "Heta demêko derg normalbîyayîş mumkin nêaseno. Ri bi ri perwerde zî zaf mumkin nîyo. Ma zî fikirîyayî ke perwerdeyo onlinî imakananê neweyan mojneno ma. Bi dersanaê onlinînan ma şênê xo biresnê xeylê kesane û xeylê kes zî şênê nê imakanan ra fayde bivîno. Mesela kursanê ma de Sîne ra bigêre heta Almanya, Kirmaşan ra bigêre heta Îstanbulî kursîyerê ma estê. Nê semedan ra, ma vat ke ma dersanê onlinînan bidomnî."

'Bêrî ma ziwane xo bîmusî'

Sayinî tewr peynî semedê ziwane kurdî veng da û wina qedêna: "Nika ma reyna dersanê onlinînan danê destpêkerdene. Dersê ma 1ê Hezîrane de dest pê kenê."

Seba nê dersan zî heta nika 249 kesane seba kirmanckî muracat kerdo. Ez vana ke, rast o vîrusî cuya ma taye teng kerde. La hetê musayîşê ziwane ra firsendêko baş da ma. Êdî ma kotî de bibî zî muhîm nîyo. Seba musayîşê ziwane tena yew xetê internetî û bernamayê zoomî ma rê bes o û ma vanê ke bêrî ma pîya ziwane xo bîmusî û ziwane xo aver berî."



Cejna we pîroz be!

Ji bo siberojên bitenduristtir,
di vê cejnê de em dûrbûna xwe
ya civakî berdewam bikin û
li mala xwe bimînin. Bi hêviya
rojên bixêr û xweşî cejna we ya
Remezanê pîroz be...



Odeya Bazirganî û Sanayîyê ya Amedê

Dewey Ma



Cemil Oguz

cemilo@diyarname.com

Çi eleqeyê Elon Musk û kirmanckî têdir est o?

Belê pers na ya, çî eleqeyê Elon Musk û kirmanckî têdir est a? Ene hikayeya ma ya ke dinya şîna aşmî, ma hema nêşkenê di çekuyan biyarê têtete.

Mesela tîya ra vecîya:

Elon Musk CEO'yê Kompaniya Tesla yo. Tesla kar daya verê xo ke dinya ra merdiman bero feza û ewca ra merdiman bîyaro dinya. Yanê miyanê dinya û feza de karê berdiş û antişî bikero. CEO'yê Tesla Elon Musk û kaykerdê Hollywoodî Tom Cruise çendeyke verî peyman girêda ke feza de film bancê. Ger ê beşkê feza de film bancê di tarîxey dinya de go bibo filmo yewin de fezaye yeno viraştîşî.

Ma bêrê ser mesela: Elon Musk çendê rocî verî daxuyanî da çape-menî û vat: "Panc serî dimara ma go yew 'çîp' ke bi pîlan xebetêno bikere miyanê serî merdiman û bi nê çîpî pêdivî merdiman bi musayîşê ziwane do nêmano. Kam, kînga, kamco ziwane biwazo go bernameyê bikero hedre û tedir xeberî bido." Me serê ene joy de Diyarname de xebere viraşte û serê twittirî de zî kerd vîla. Hevalê mi, civaknas Zekî Ozmen vat: "Ma bîlesebeb qeybî kurdî xo decnenê, panc serî dimara pêdivî bi ziwane nêmanena. Xo rê keye de vinderê."

Roja ke Vîrusê Korona est o û ma keye de yê, ez nêvirdeta. Enî demî de mi zehf kitabê kirmanckî (zazakî) wendî û serê ziwane de zî ez henî xebetîyayim. Mi henî notê xo yê serê zaravay kirmanckî de twittir de kerdî vilay ke insanen rê fêdey cînan bibo.

Reyna serê twittirî ra mi va: "Zekî, yanê ti vanê ez bîlesebeb endêke xo aciz kena, notanê serê kirmanckî de kena hedre û tîya kena vîla?"

Va: "Erê, hema ca de fek tera verade."

Hebet Şengul Ogur kewt mîyan va: "Goş meşa Zekî"...

Axir ma têdir yarî bikerê zî ene mesela çînan bine mocnena ma: Dinya her game tewf zaf verê xo dana teknolojî, teknolojî raver bena û go hema zahf raver bera zî.

Elon Musk, o ke ene xebere kerd vîla wayirê 40,7 milyar dolarî yo. O wazeno merdiman bero feza û bîyaro.

Ma tûtî bî, ma bi darikan kay kerdêne. Wexto ma di tûtan serê darikan de dayne pêro, pilêkey ma hameyneye vatê: "Şar şîyo aşmî, şîma hema serê di darikan de danê pêro."

Erê şar tam 51 sere verî şî aşmî; enka zî şar şîno feza. Elon Musk wazeno merdiman bero feza û bîyaro. Belkî siba di sibay, çend serrî dimara feza de qey jîyaney merdiman zî ca bêro viraştîşî, belkî merdimî ewca jîyaney xo dewam bikerê... Ma nêzanê. La ma zanê ke dinya zaf û zaf ma ra ravêrêti ya.

Erê, dinya sera şora zî ma mecbûrê ziwane xo bîmusê, biparêzê û raver berê. La heto bînan ra zî pêdivî ma pê est a ke ma goş bişanê dinya, ma bawnê sera şîna, ma di miyanê dinyaya newî de çî ya û çîqa ca gênê?

Eliyê xemxwar

Eliyê xemxwar di herêma xwe de tu alozî nedixwestin. Li herêma Elî lê dijî, çî pirsgrêk çêbibin Elî diçe û pirsgrêkan çareser dike. Loma jê re dibêjin Eliyê xemxwar. Êvarê Elî li ser şivê ye, yek li derî dixê. Hevsera wî derî vedike, dinîhêre ku xortekî ji gundê wan li ber derî ye.

Hevsera Elî: Xorto te xêr e?

Kurik: Xalê Elî li malê ye yan na?

Hevsera Elî: Erê li malê ye, xêr e?

Kurik: Welêhî kera me zaye lê ceşika wê bê terî ye, bavê min got here ji xalê xwe Elî re bibêje, kanê ew çî dibêje?

Hevsera Elî: Niha Elî li ser şivê ye bila şiva xwe bixwe û dawiyê tu yê jê re bibêjî.

Kurik: Dibêje bila be tişt nabe. Her du diçin oda Elî.

Elî: Xwarzî, kerem bike were şivê bixwe!

Kurik: Noşican be xalo min şiv xwariye.

Elî: Xêr e tu hatî çî?

Kurik: Xalo şiva xwe bixwe. Ezê dawiyê ji te re bibêjim.

Elî: Na tu yê niha bibêjî.

Yek ji Elî û yek ji kurik, kurik neçar dimîne û dibêje:

Xalo welahî hal û mesele ev e.

Elî kevçiyê di qurmê dîwar de werdike û dibêje:


De were şivê bixwe.

Hevsera wî dibêje:

Ma dinya xira bûye ku tu weha dikî. Dana xwedê ye. Ma tu yê çî bikî?

Elî dibêje: Ez ê çav û bîbikê te derînim, ez ê çî bikim ku tu dibêjî dana xwedê ye. Ma karê xwedê nemaye ku ji me re kerê bêterî bi rê bike. Niha sibê ev ceşikê mezin bibe û dê xwediyê wî bar lê bike û bibe aşê. Tu jî dizanî ku riya aşê Bexşo herî ye û kerê di heriyê de here xwarê. De îca xwediyê kerê dê bi ku dera kerê bigire û wî ji nav heriyê derxe. De ez nabêjim îca tu bibêje, ew ê bi qemçika te bigire, ez ê çawa şivê bixwim kera çolê.

Riza Uyar



Sadê gitgitî

Şêxê Temir ji Mihemedê Sadê xwest ku ebaya xwe bidiyê ji bo li xwe bike û here bajarê Amûdê. **Mihemed got:** "Amê Şêxo ez ê bidim te, lê divê tu navê bavê min bikî Sadûn Axa." Şêxo eba bir û soz da ku ji bavê wî re bêje Sadûn Axa. Qantireke Mihemedê Sadê hebû şemûs bû, bêkêr bû. Di ber halet de xwe dixist û cot nedikir. Mihemed ew dever haydar kir ku qantirê difroşe. Rojekê dema civata gundiyan li ser bêderê digere, rêwiyekî biyan hat.

Rêwî silav li wan kir û

got: "Gelî ciwanmêran, mala Mihemedê Sado li kîjan hindamê ye?" Şêxo di cih de çîrok nas kir. **Çav kir gundiyan û bersiva wî da got:** "Birazî, Mihemedê Sadê

li vî gundî tune, lê Mihemedê Sadûn Axa heye." Mêrik got: "Yabo bi namûs mala Sadê li vî gundî ye û bavê min ji wan re dibêje mala




Sadê gitgitî, min bihîstiye qantireke firotinê li cem heye."

Şêxo da mandelê. Yê rêwî rabû çû. Mihemed piştî çend rojan bi vê dabasê hay bû, hat cem Şêxo gazind jê kirin ku çawa nehiştiye mêrik qantira wî bikire. **Şêxo jê re got:** "Min ji te re got bi navê bavê xwe nelîze, me Sadê kir Sadûn Axa li gorî daxwaza te vêca em ê gitgitî çawa jê vekin."

Abas Ismaîl

XAÇEPIRS



Jİ ÇEPÊ BER BI RASTÊ

3. Cînavkek 5. Televizyoneke kurdî ji yê destpêkê 7. Pirça mîhan
8. Daçekek 9. Fikir û ramana der barê tiştêkî de 13. Destvekirî, ne xesîs 14. Roja em tê de ne 16. Bajarekî bakurê welêt 19. Torbe, kis 20. Sembola welatan
21. Heyat, jîyan 22. Serkêşê mîrîtiyê 25. Sewaleke kedî ya bi kerîyan tê xwedîkirin
26. Xelkê Îranê 28. Helbestvanekî kurd, seydayê...

Jİ JOR BER BI JÊR

1. Di nav werzê zebeşan de çêdibe rengîn û bêhnxweş e
2. Ne sax, ne zindî...
3. Notayêke muzîkê
4. Wext, zeman
6. Komeke zimanên kevin a ku kurdî jî di nav de cih digire
10. Gir, inyard
11. Cihê çem tê re derbas dibe
12. Rik 15. Rewşa awarte
17. Koma mirîyan, koma pez
18. Şaristaniyêke kevnar
20. Keser 23. Tav
24. Reh û koka kurdan
27. Rojêke hefteyê

Bersiva heftaya borî



